



Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Osman Öcalan:

KT nikare hesab bipirse dê hesab bide




■ Komplo çû serî

Her çend neteweya kurd bêdewlet be jî, vê dawiyê bi qasî ku tu neteweyên din heya îro neketine rojeva cîhanê, ketiye rojeva cîhanê. Ev yek, bi komploya navneteweyî ya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê pêk hat. Her çiqas dewleta tirk girtina Öcalan wekî serketina xwe nîşan dide jî, di serî de DYA, Îsraîl û Yewnanistan xwedan rola sereke ne. Wekî ku endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Cemil Bayik jî dibêje ev komplo, li dijî gelên Rojhilata Navîn e jî û ewê bibe sedema guherînên girîng.

■ Gel rabû ser piyan

Li aliyê din Kurdistaniyan li dijî komployê rabû ser piyan û kir ku sê wezîrên yewnanî îstifa bikin. Wekî din her çend rayedarên Tirkiyeyê xwe serkeftî dibînin jî, wekî gelek rojnamegerên cîhanî dibêjin, dê ji ber rewşa nû bala dinyayê bikişîne ser xwe. (Nûçe: R.8-9)



SAMI TAN

Serokatiya Öcalan û tevgera kurd

Komplota ku di 9'ê kewçêrê de dest pê kir bi awayekî ku tu mirovê kurd ê xwenas nedixwest encam. Serokê Giştî ve PKK'ê Abdullah Öcalan bi listikeke navneteweyî kete destê dewleta tirk. Daxuyaniyên rayedarên PKK'ê nişan didin ku heza kontra ya navneteweyî ku jê re gladyo tê gotin, ev karê kirêt pêk anîye. Çete û serokçeteyên faşîst ve roja ku Öcalan dil ketiye, wekî cejn bi nav dikin. Hinek safikên tirk ku kezeba wan ji ber şerê kirêt şewitiye jî bi komikên faşîst dixapin. Ew hevî dikin ku bi ve yekê de dawî li tevgera kurd bê û de şer biqede.

Her çiqas hinek welatên ewrûpî û hinek nivîskarên liberal ên tirk didin zanîn ku bi girtina Öcalan derfeta çareseriya neleşkerî ketiye destê dewletê jî serkêşên gladyoyê amadekariya jî nû ve serbetonkirina kêşeya kurdan dikin.

Lê çalakîyên gelê kurd tiştêkî din nişan didin. Piştî dilketina Öcalan bi

hezaran Kurdistanî li çarmedorê cihanê rabûn ser piyan. Bi taybetî li Ewropayê balvozxaneyên serfistikvanên komployan hatin dagirkirin. Her wiha li gelek bajarên Kurdistan û Tirkiyeyê jî çalakîyên girseyî pêk hatin.

Xuya ye ku dilketina Serokê PKK'ê Öcalan ne xesareke mezin e bo tevgera gelê kurd. Lê divê neyê jibirkirin rêberîya Öcalan bo tevgera kurd rêberîyeke stratejîk e. Tê zanîn ku pêşengîya stratejîk beşdariya fîzîkî li ser yekî ferz nake. Ango heke Öcalan di girtîgehê de be jî dikare bi karê xwe rabe. Jixwe bi dehan berhemên wî jî dikarin ji gelê kurd re bibin rênîşandar. Her wiha tê zanîn ku Öcalan, kesayetiyeke taybet derxistiye holê, ev kesayetiê de tevgerê geştir bike.

Dilketina Öcalan dilê gelê kurd xemgîn kir. Lê gir û hêrsa wan li dijî dagirkeran zêdetir bû. Ew gir û hêrs, heke bi zanati bikeve tevgerê, dikare

bibe hêz û wize bo geşbûna tevgerê. Li aliyê din doza gelê kurdî piştî ve bûyera nebişer jî zêdetir kete rojeva cihanê. Dadgeha Öcalan de bibe platforma nîqaşkirina kêşeya kurd û de sîcê dewleta tirk yek bi yek bîn eşkerekirin.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku gelê kurd jî ve komploye fêrî gelek tiştan bû. Berî her tiştî hate ditin ku ve kêşeyê li Enqereyê dest pê kiriyê de li Enqereyê çareser bibe. Şerê li çiyayên Kurdistanê û têkoşîna li metropolan de jî bo çareseriyê diyarker be.

Li ser Yewnanistanê jî mirov dikare ve bibêje, gelê yewnan her tim li hemberî tirkan tîk çûye. Sedema sereka ya tîkçûna wan jî piştewaniya kurdan a bo tirkan e. Di bûyera Öcalan de Yewnanistanê derfeta serkeftinê bi dest xistibû, lê mixabin bi sava serê gladyoyê wê derfet ji dest da.

Vê kêşeyê li Enqereyê dest pê kiriyê de li Enqereyê çareser bibe. Şerê li çiyayên Kurdistanê û têkoşîna li metropolan de jî bo çareseriyê diyarker be.

Tu dîwar nikarin azadiyê dîl bigirin

Ferhengok

awêne: neynik, mirêk	kirêt: gemar, qirêj
berjewendî: çikar	komkuji: tertele, qetliam
berzeq: muste-hcen, muzir	maf: heq
biryardarî: kararlî	navneteweyî: uluslararası
biwêj: îdiom, deyim	nexşe: harita
cebilxane: cephexane	neyînî: olumsuz
cure: tür, çeşit	parêzer: ebûqat
çalakî: eylem	pêşbazî: pêşbirk (yarışma)
çapemenî: basın	pêşewa: lider, önder
çavdêr: gözlemci	pêwîst: pêdivî, lazim
dadgeh: mahkeme	piştrast: pêbawer, emîn
dadyane: dadyarî, adîl	rêz û rêçik: kural û qaide
darizandin: yargılama	rûdan: qewimîn (gelişme)
daxuyani: açıklama	şewe: awa (biçim)
dilgirtin: esîrgirtin	teqez: misoger (kesin)
erênî: olumlu	vederbûn: derketin
helwest: tutum, tavir	xetere: tehlike
hevalbend: mütefik	
hêz: kuvvet, güç	

MÎHRAÇ URAL

Serok êsir ket. Bi rûmet û nefsbîçûkî xwest gelê xwe jî geravê rizgar bike, lê beramberî rewşeke ku pêkan e her şoresger beramber bîmîne, ma. Cihan bi ve rûdanê jî binî ve diheje. Her çiqas em qebûl nekin jî pêvajoya "Dîlbûna Serok" dest pê kir. Lê ev şoresgerê sedsala 20'an ê herî mezin dîl be jî serok e.

Ev 18 sal e ez bi hevrê Abdullah Öcalan re di nav tîkiliyeke dostane ya şoresgerî de me. Pêvajoyeke kûr û dûr e, tîkiliya me di nav gelek rûdanên hevbeş de bi şewirîn û piştîgiriye kûrtir bû. Ji destpêkê hetanî niha tîkiliyên min û wî li ser bingeha tîkiliyên azadiyê û demokrasiyê ya gelên Anatoliyê hate honandin. Di tîkiliya navborî de kurdûbûna Apo û erebbûna min rola sereke nedilîst. Di danûstandinên me de gelê tirk jî di nav de ji bo tîkiliyên azadî û demokrasiya gelên Anatoliyê hilgirtina wêzîfeyan cih digirt.

Serok aşîxwazekî ku ji bo şoresê şer dike ye, min di nav 18 salan ev yek dît. Ji civîna me ya ku 14 rîxistinên Tirkiyeyî beşdar bûbûn a di 1982'an de li rojhilata Navîn ji bo sazîkirina Li Dijî Faşîzmê Eniya Berxwedana Yekgirtî, hate lidarxistin hetanî axaftina me ya dawîn perspektîfa diyaloga me ev bû: Li ser bîcihanîna daxwazên demokrasiyê û azadiya gelên Anatoliyê lidarxistina "Kongreya Gelên Anatoliyê" û girêdana "Peymana

Lozanê ya Duyemîn" rawestî û hûrbûn bû. Di esasê ve de bratî û dostaniya gelan hebû. Digot li şûna şerê bêencam ê ku her kesî dirûxîne, divê "Em di bin serweriya gelên cihanê de Lozana duymîn biafirînin." Lê rayedarên tirk li hemberî wî mirovê aşîxwaz û şervanê şoresê jî bilî metoda barbar, çavsor û mekanîzmeya şer serî li tu metodan neda. Dewleta tirk ev mîrata qirêj ji osmaniyan girt. Ev, metoda ku Ewropa û Rohilata Navîn sed salan hingaftî metoda

mafên xwe lez neda xwe, bêgîlî û gazin û bédeng ma, li pêşîya netewebûna gelan nebû asteng. Bi navê bratî û dostaniyê her dem hêviya roja rizgarkirina azadî û rûmeta xwe ma. Li ser rûyê cihanê ez bawer nakim ku gelekî wiha aşîxwaz hebe. Serokê Dîl jî wekî ewledêkî wî gelî bi heman gavên aşîyane daxwazên neteweya xwe dubare kir. Lê hate redkirin. Bêxwedî ma. Ew jî wekî neteweya xwe ji aliyê dostên xwe ve hate xapandin. Lê bi biryardarî û prensîbên xwe ruhekî ebedî afirand. Di vir de mirov bêtir di rastiya wateya divê her nîşekî nû ye kurdan bibê Apoyek digihêje. Dema mirov rastiya Serok Apo dikole ev derdikeve holê: Ji bo azadî, serxwebûnê bi rûmeta şoresgerî redkirina teslîmyetê û di her mercan de nimandina nîrxên mirovahiyê, piştîgiriya aşîyeye dadyane ye. Apo bi eşkereyî ev e.

Serok Apo bi rûmet û nefsbîçûkî xwest gelê xwe jî geravê rizgar bike. Rayedarên tirk li hemberî wî mirovê aşîxwaz û nûnerê rûmeta mirovahiyê jî bilî metoda barbar û mekanîzmeya şer serî li tu metodan neda.

"Aqilê tirk" e. Dirindetiya ku Roja azadiya gelê kurd bi ewrên xwe yên tarî dil girt jî wî aqilî tê.

Lê, gelê kurd jî kesekî tu tişt nexwast. Tenê xwest li ser axa bav û kalên xwe wekî gelekî azad, birûmet û hemdem bijî. Ji bilî jî ser xwe avêtina axa mirinê jî tu tişt nekir. Ev jî wekî tê zanîn di dîroka gelan de gava herî asgarî ye, daxwaza herî mafdar e û nefsbîçûkî ye. Kurdan bi êş û keserên sedan salan dilê xwe dagirt, bêyî ku tiştêkî bixwaze ked û xwedana keç û lawên xwe ji bo azadî û pêşketina gelên herêmê pêşkêş kir, piştewaniya şerên rizgariyê kir, ji bo

Kurd xwedî qezencên wisa ne ku tu surprîzên mirov lê napê nikarin wan jî destê kurdan bigirin. Zengîniya ku de dijîminên gelê kurd şaş û matel bike jî ev e. Hêrs û gira ku piştî Serok hate girtin ji nişka ve rû da de piştî demekê aş bibe, aqilê rexnegir de tîkêve şûna hestên reaksiyonar. Piştî ve sergêjên ku Tirkiyeyê bi rê ve dibin bivê nevé de nikaribin azadiya gelê kurd û daxwazên demokratîk ên gelên Anatoliyê asteng bikin. Gelê kurd de bi hêzdarî jî ve pêvajoyê derkeve. De zelal bibe ku di warekî zîndanê ye ku karibe bi bilindahiya xwe azadiya Serok asteng bike tu neye.

Komplot karê gladyoya navneteweyî ye

Ji encama Peymana Washingtonê dihate xuyan ku divê Öcalan ji Rojhilata Navîn derkeve. DYA'yê li Başûr ji bo damezrandina dewleteke kurd hemû plan û projeyên xwe çêkiribûn. Dor hatibû êrêkirina dewleta tirk. Dewleta tirk bi şewazekî tund li dij derket. Lewra dewleteke kurd, dê yekîtiya axa dewleta tirk bixe xetereyê.


Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji aliyê hêzên imperyalist ve, bi hevkarîya Kenya, Rûsya, Yewnanîstan, Îsraîl û Amerîkayê ji balyozxaneyê Yewnanîstanê ya li Kenyayê roja 15'ê meha reşemiyê hate revandin. Wekî tê zanîn Öcalan ji bo ku di demeke zûir de Kêşeya Kurd çareser bike, ji Rojhilata Navîn ber bi Romayê ve dest bi meşa azadiyê kiribû. Beriya ku Öcalan biçe Romayê gelek welatên ku iro di nav komploya navneteweyî ya li dijî kurdan de xuya dikin, ew vewendibûn welatê xwe. Bi taybetî jî di qada navneteweyî de di rojên pêşîn de ji bo çareserîya Kêşeya Kurd rewşeke erênî serdest bûbû.

Lê komploya navneteweyî jî digel wan rûdanên erênî pêgeha xwe fireh dikir. Ji bo serkeftinê pêwîst bû ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan were girtin. Ji ber ku gelek politikayê komployî û fitnekar yên li ser gelên Rojhilata Navîn eşkere dikir. Dîsa hevkarîya sîyonîzmê û imperyalîzmê û di encama vê hevkarîyê de zilma dewleta tirk a ku li ser kurdan dihate meşandin jî eşkere dikir.

Bêguman ne ev yek tenê, bîrdoza ku Öcalan afirandibû bûbû tîrsa herî mezin a sîyonîzm û imperyalîzmê. Van her du hêzan jî dixwest ku li Rojhilata Navîn desthilatdariya xwe xurtir û mayînde bikin. Lê belê ji bo vê yekê jî pêwîst bû kurdên ku bi bîrdoza Öcalan rabûne ji holê bên rakirin. Di serî de armanca wan girtina Öcalan, dûre bêtêskirina PKK'ê bû. Her wiha dîsa dihat xwestin ku kurd li rewşa berê bêne vegeandin. Di 9'ê kewçêra sala 1998'an de gava yekem a vê komployê hate avêtin. Dewleta tirk li dijî Suriyeyê şer îlan kiribû. Öcalan jî li ser vê yekê ji Rojhilata Navîn derketibû û berê xwe dabû cihanê.

Amerîqa Îsraîl û dewleta kurd

Berîya Peymana Washingtonê bingeha komployan hatibû danîn jî. Ji encama peymanê dihate xuyan ku divê Öcalan ji Rojhilata Navîn derkeve. DYA'yê li Başûr ji bo damezrandina dewleteke kurd hemû plan û projeyên xwe çêkiribûn. Dor hatibû êrêkirina dewleta tirk. Dewleta tirk bi şewazekî tund li dij derket. Dewleta tirk diyar dikir ku dema li Başûr Kurdistanê bê damezrandin, dê yekîtiya axa dewleta tirk bikeve xetereyê. Lê piştî ku Îsraîl û Amerîkayê ew bi hinek temînatên aş kirin kirin, dewletê dengê xwe birî. Di temînatnameyê de bi kurtasî wiha dihate gotin: "Dema PKK ji holê bê rakirin li Başûr avabûna dewlete kurd jî ji bo perçebûna axa dewleta tirk wê ne xeternak be." Bi vê yekê sîyonîzm û imperyalîzmê dixwest ku li ser erdê kurdan



Abdullah Öcalan

ji bo xurtbûn û serdestiya xwe Kurdistanê wekî pîrekê bi kar bînin. Lê belê di serî de Öcalan, dûre jî gelê kurd bi vê planê hesiya û li dijî wê planê dengê xwe bilind kir.

Rûsya jî tevli komployê bû

Serokê PKK'ê piştî ku ji Rojhilata Navîn derket, çû Rûsyayê. Lê mixabin li gel biryara Dûmayê jî hikûmeta Rûsyayê bersiveke erênî neda daxwazên Öcalan. Piştî vê helwesta neyînî ya Rûsyayê hikûmeta yewnan jî heman helwest nîşan da. Di wê pêvajoyê de kurd hêdî hêdî di ketin rojeva cihanê. Yekemîn car bû ku kurd bi awayekî wisa berfireh bûbûn ser mijara cihanê.

Rûsyayê dîsa dixwest ku rola xwe ya dirokî bi cih bîne. Wekî tê zanîn sedema bingehîn a hilweşîna Komara Mehabadê

Rûsya ye. Vê carê jî Rûsyayê dixwest ku kurdan li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne. Wekî diyar e êdî di van demên dawîn de Rûsya di nav qeyraneke aborî de ye. Bêguman vê yekê bala dewletên imperyalist, sîyonîst û hevkarên wan bêhtir kişandibû ser xwe. Li Rojhilata Navîn hevkeşe bi pêngavên kurdan diguherî. Bi taybetî jî pêşîn hêviyekê xwe berdabû dilê gelê kurd. Lê belê li gorî sîstema cihanê ev hêvî, hêviyeke giranbîha bû. Ji neftê bigirin heta ava vexwarinê û dewlemendiya xwezaya Kurdistanê ketibû ser maseyê. Wan jî nedixwest ku kurd bi ser bikevin. Lewre jî pêgeha komploya navneteweyî roj bi roj firehtir dibû.

Pêvajoya Romayê

Piştî ku pêvajoya Romayê dest pê kir ji aliyê diplomasiyê ve serî li dewleta tirk geriya. Rayedarên tirk li dijî têkoşîna kurdan banga seferberiyê kir. Dewleta

tirk ev yek jî dîsa bi temînatên DYA'yê dikir. Şerxwazî û hovîti derketibû ser sahnayê. Dewleta tirk dîsa bi hevkarîya Îsraîl û Amerîkayê dest bi kampanyayên tunekirina gelê kurd kir. Gelê kurd wê demê li hemberî van yekan bédeng ma. Ji ber ku gelê kurd jî êdî bûbû xwedî stratejî. Stratejiya bingehîn siyasîbûn bû. Bi pêşengiya Öcalan ji bo kurdan mizgîniya xweş dihate bihistin. Lê hîna jî bêhna komploya navneteweyî xwe ji ser Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan nedabû alî. Di her fersendê de Öcalan diyar dikir ku roj bi roj komplot di şexsê wî de kurdan wekî hedef digire.

Ewrûpayê berpirsiya xwe bi cih neanî

Li gel van yekan Ewrûpayê jî bo çareserîya kêşeya kurd tu gav neavêtin. Bêhtir li gorî daxwaz û armancên Amerîkayê tevgeriya. Ewrûpaya ku ji aliyê Amerîkayê ve dihate birêvebirin, wekî Îngilîstan û Fransa jî bo dayîna statûya siyasî bo Öcalan tu gav neavêtin. Almanya jî li aliyekî nedixwest ku xwe têkilî kêşeyê bike. Masîmo D'Alema bo stendina piştgiriyê li welatên Ewrûpa geriya. Lê tu encam bi dest nexist. Ji vê yekê jî diyar dibû ku êdî wê komploya navneteweyî li gorî xwestaka Îsraîl û Amerîkayê bê lidarxistin. Jixwe dewleta tirk jî berê ve bi Îsraîlê re peymanê hevkarîyê îmze kiribû. Hêzên veşarî yên wan dewletan tevî Yewnanîstan û Rûsyayê dewleta tirk gav bi gav ji hemû rûdanan agahdar dikirin. Çima? Li aliyekî Qîbrîs, li aliyê din jî desthilatdariya Rojhilata Navîn ji bo Rûsyayê jî ÎMF'ê butçe veqetandibû.

Komplot bi ser ketibû

Belê di encama gera sê mehan de Serokê giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji aliyê CIA-MOSSAD û MÎT'ê ve li Kenyayê jî balyozxaneyê Yewnanîstanê hate revandin. Dewleta Yewnanîstan bi destê hêzên xwe serokê PKK'ê teslîmî Tûrkiyeyê kiribû. Yewnanîstanê çima bi taybetî Kenya hilbijartibû? CIA û MOSSAD li Kenyayê lotikan diavêjin. Di meha gelawêjê de balyozxaneyê DYA'yê ya Kenya û Tanzanyayê hatibû bombekirin. Qaşo ji bo ewlekariyê DYA'yê ji Kenyayê xwestibû ku çend endamên CIA û MOSSAD'ê li wê derê bi cih bike. Ev yek ji aliyê Yewnanîstanê ve dihate zanîn. Nexwe çima Kenya? Senaryoya komploya navneteweyî ber bi dawiyê hatibû. Ji bo teslîmkirina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan cihê herî guncaw Kenya bû. Li gorî ragihandinan Kenya ji aliyê hêzên nehênî ve tê birêvebirin, erka dewletbûnê jî gelekî qels bûye.

Jiyaneke ku li welatên dereke zîldayî:

Qanatê Kurdo

Di dîroka Kurdistanê de ji bajarê Qersê gelek ronakbîrên kurd ên navdar derketine. Piraniya ronakbîr û nivîskarên kurd ên ku li Kevne-Sovyetê jiyane ji Qersê çûne wir. Mirov dikare gelek ji wan kesên ku ava hênik a zozanên Serhedê vexwarine rêz bike: Erebe Şemo, Casimê Celil, Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Qaçaxê Mirad û hwd. Zimanzan û kurdolog Qanatê Kurdo jî yek ji wan e.

Qanatê Kurdo di sala 1908'an ji 1909'an de li bajarê Qersê gundê Sûsîzê ji malbateke êzîdî ji dayik bû. Ew ji wekî gelek ronakbîrên kurd di nav mercên giran ên belengazî û hejariyê de jiyaye. Her wiha êzîdîbûna wî barê wî girantir kiriye.

Rev û bez

Bi Şerê Cihanê yê Yekemîn re Bajarê Qersê serobinî hev û din dibe. Şênîyê bajêr ji karesata navborî ji her aliyê ve zereke mezin dibîne. Kurd û ermeniyên ku cînar û kirivê hevdu bûn, bi dek û dolabên dewleta osmanî bi hev dikevin, osmaniyan giregir û rûspiyên ku di nava kurdên misilman de xwedî rêz û rûmet bûn dixapîne û li dijî ermeniyên bi kar tîne. Her wiha kurdên êzîdî jî ji vî karesata trajîk bêpar namînin. Şênîyê bajêr vî rewşê bi navê "rev û bez" dinavîne. Qa-

natê Kurdo li ser kurdolojiyê 18 kurdnasan digihîne. Kurdo bi şarezayî û afirîneriya xwe di warê zimanzanî û kurdolojiyê de gelek berhemên hêja li pey xwe dihêle. Di navbera salên 1961-1985'an de li dora 25 salan serokatiya Beşa Kurdolojiyê ya Lenîngradê dike.

natê Kurdo jî wekî gelek ronakbîrên kurd hîn di zarokatiya xwe de di sala 1918'an de digel malbata xwe dikeve ber pêlên rev û bezê û ji ber çavsorî û destdirêjiya dewleta osmanî ji cih û warê bav û kalên xwe dûr dikeve. Berê xwe dide Ava Reş. Piştî ku bi qewlê gelê herêmê gelek welatên dereke li pey xwe dihêle dîsa ji ber hovîtiya dewleta osmanî bêhtir dûr dikeve û xwe digihîne serbajarê Gurcistanê, Tiflîsê. Piştî pêleyekê bi keser û jana dûrketina ji welêt li vî welatî bi cih dibe.

Li aliyê din li Tiflîsê dibistanek ji bo ciwanên kurd vedibe. Kurdo jî dest bi vî dibistanê dike. Ev dibistan di jiyana wî de guherîn û pêşketineke mezin tîne pê. Di sala 1928'an de li perwerdeya xwe ya li vî dibistanê dibe serfî. Piştî kurtedemê Kurdo bi Erebe Şemo re hevnas dibe. Kurdo di axaftineke xwe de têkilidana xwe ya digel Erebe Şemo wiha tîne zimên: "Erebê

Şemo ji min pirs kir, got: Kuro tu kî yî? Min go: Em ji Qersê hatine, gundê me Sûsîz e. Erebe Şemo go: Kuro, lê ez jî ji Sûsîzê me. Min go: Ez zanim tu şêx î. Wî go: Şêxê çi malxirab. Nedixwast ez bêjim şêx e da, hingê pêşberî şêxan şer dikirin. Îcar ew şêx bû lê bûbû komûnîst."

Komûnîstekî jêhatî

Qanatê kurdo jî wekî tevaya ronakbîrên kurd ên Kevne-Sovyetê dikeve bin bandora bîrdoziya sosyalîst û rengê jiyanê wî diguhere. Lewre jî piştî ku Şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê dike Qanatê Kurdo dil dike ku di ber Artêşa Sovyetîstanê de bi Naziyan re şer bike. Lê destûrê nadinê û di destpêkê de vî daxwaza wî bi cih naynin. Bi destpêkirina şer re artêşa Naziyan êrişî Sovyetîstanê dike û hawirdora Bajarê Lenîngradê digire. Lê peyre ji bo şerkirinê rê li ber Kurdo vedibe. Piştî ku vî yekê dibihîse ji şabûnan lingê wî erd nagire û bi dilxwazî tevî nav refên Artêşa Sor dibe û bêwestan û rawestan li hemberî êrişên faşîzmê tîdikoşe û li ber xwe dide, di mercên xedar ên gemaroya li ser Lenîngradê de dijî. Piştî ku Artêşa Sor di encama şerê digel Naziyan de bi ser dikeve Qanatê Kurdo dibe endamê Partiya Komûnîst a Yekîtiya Sovyetê. Li ser pîrsekê Qanatê Kurdo li ser şerê navborî serpêhatiyên xwe wiha vedibêje: "Min dixwest (dixwaze beşdarî şer bibe) lê ez nedibirim. Digotin kategoriya te î-zîn nade ku em te bibin şer. Lê faşîst habitûn û dora Lenîngradê girtibûn. Virda, wêda, belengazî, çetînî çî bêjî hebû. Da ez kurmancî im, min çetînî gişk dan alîkî. Min karî ez ji muhaserê derkevim... Paşê ez çûme şer, min şer kir, şer xilas bû."

Bengiyê ziman û çanda xwe

Prof Qanatê Kurdo bi qasî ku ji welatê xwe û doza xwe hez dikir, evîndar û bengiyê ziman, wêje, dîrok û folklorê gelê xwe bû. Di pêşgotina berhema Qanatê Kurdo ya bi navê Tarîxa Edebiyata Kurdî de welatparêzî û kurdewariya wî wiha xwe dide der: "Hukmetên stemkar yê cîranên kurd her çar aliya dor kurdan girtine. Kurdistan kirine girtîxane, kurd qeyd û cîdar kirine, bi sala û zemanan xwestine û dixwazin kurdan li nav xwe de bifetisînin, bihelînin, ruh û canê kurdeweriyê ji dil û hinavê wan derînin, wan bêhiş û bêsewda bikin, wisa bikin ku ew

zmanê dayka xwe şîrîn, zimanê xwe yê zikmakî biterikînin, tarîxa xwe, tarîxa şaristanî û medeniyeta xwe nizan bin; hukmetê stemkar bi vir û fîstona kurda dixapînin, navê "Tirkên çiyayî", "Farsên çiyayî û navê "Erebê paşketî û koçer" wan kirine..."

Erebê Şemo jî bo xwendekarên kurdî Partiya Komûnîst a Ermenîstanê 8 bûsan distîne. Qanatê Kurdo jî yek ji wan bûrsdaran e. Di rezbera heman salê de li Zanîngeha Lenîngradê dest bi perwerdeya akademîk û zanistî dike. Li ber destê Rojhilatnasên navdar ên Sovyetê xwe digihîne û beşa Îranzaniyê hildibijêre. Her wiha hînî zimanên belûcî û pamîlî dibe.

Qanatê Kurdo di sala 1934'an de di Zankoya Filolojiyê û Înstîtuya Xebatkarîna de mamostetiya zimanê kurdî dike. Di heman salê de teza xwe ya li ser pisporiya zimanê kurdî li ser "avaniya tîgînê lêkerî" amade dike. Di sala 1945'an de di Zanîngeha Lenîngradê Beşa Îranzaniyê de dibe mamosteyê zimanê kurdî. Ji sala 1946'an hetanî 1953'yan li Zanîngeha Lenîngradê perwerdeya zimanê kurdî dide. Li aliyê din li Ermenîstanê bi taybetî mamosteyên kurd li hev dicivîne wan di warê ziman û wêjeyê kurdî de perwerde dike. Prof Qanatê Kurdo li ser kurdolojiyê 18 kurdnasan digihîne. Kurdo bi şarezayî û afirîneriya xwe di warê zimanzanî û kurdolojiyê de gelek berhemên hêja li pey xwe dihêle. Di navbera salên 1961-1985'an de li dora 25 salan serokatiya Beşa Kurdolojiya ya Lenîngradê dike. Her wiha dibe endamê hîndekariyê Akademiya Zanistê ya Iraqê û endamê rûmetê yê Înstîtuya Kurdî ya Parisê. Qanatê Kurdo digel gelek zimanên biyanî zaraveyên kurdî; kurmancî û soranî baş dizane. Mirov dikare bibêje di dîroka kurdan de piştî Celadet Bedirxan kesê li ser zimanê kurdî herî şareza û jêhatî Qanatê kurdo ye her wiha ne tenê li ser zaraveyê kurmançî li ser zaraveyê soranî jî gelekî serê xwe êşandiye û berhemên wî hene. Bo nimûne, pirtûka wî ya bi navê "Gramera Zimanê Kurdî" bi soranî û kurmançî hatiye nivîsin û pirtûkeke danberhevî ye. Dîsa pirtûka xwe ya bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdî" kiriye du beş, beşek jî bo helbestvanên kurmançî beşek jî bo helbestvanên soranî veqetandiye. Qanatê Kurdo di ber berhemên xwe re gelek gotar nivîsîne di rojname û kovarên tevî de li dora sed gotarên wî hatine weşandin û sed jî berhem nivîsîne. Wekî: Ferhenga rûsî-kurmançî, ferhenga rûsî-soranî, Gramera Zimanê Kurdî (kurmançî), Di nav kurdî de navên taybet, hwd.

Qanatê Kurdo li koçberiyê, li qeraxên Çiyayê Elegezê wekî çirûskêkê çirûsî, bi tîn û tîrêjên kurdewarî û zanyarî dilê gelê xwe germ kir û mêjiyê gelê xwe ronak kir. Kurdo bi êş û jana dilê xwe di sala 1986'an de li biyanîstanê çû ber dilovanî ya Xwedê



Piştî ku Şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê dike Qanatê Kurdo dil dike ku di ber Artêşa Sovyetîstanê de bi Naziyan re şer bike. Pêşiyê destûrê nadinê lê peyre daxwaza wî bi cih tînin. Piştî ku vî yekê dibihîze ji şabûnan lingê wî erd nagire û bi dilxwazî tevî nav refên Artêşa Sor dibe û bi awayekî jêhatî û bi dilpolayî li dijî faşîzmê tîdikoşe.

Cudatiya biwêj û gotinên pêşiyên

Dema mirov bala xwe dide pirtûkên li ser biwêj û gotinên pêşiyên hatine nivîsandin. Tiştê balê dikişîne. Di warê diyarkirina cudatiya van her du tégihan de tevlihevî û aloziyek balê dikişîne. Hin caran dema mirov bi gotinekê re rû bi rû dimîne mirov dikeve nava dudiliyê, gelo ev gotina pêşiyên e yan biwêj e. Li ser cureyên biwêjan û şayes û terkîban jî aloziyê heye. Biwêj ku di îngilîzî de jê re "idiom" tê gotin di ferhenga "Macmillan Compomprary Dictionary" de wiha hatiye ravekirin: "Îfadeya di zimanekî de ku wateya wê ji wateya peyvên ku wê pêk tînin cuda ye. Ango dema peyvên di îfadeyê de ji hev bîst xistin, ew wate li holê namîne." Di heman ferhengê de gotinên pêşiyên ku di îngilîzî de jê re "proverb" tê gotin wiha hatiye ravekirin: "Gotina kurt ku tê de aqilmendiyeke taybet heye."

Di ferhenga tirkî ya bi navê "Temel Türkçe Sözlük" de biwêj wiha hatiye ravekirin: "Peyva klîşe û ji wateya xwe ya rastîn dûr ketiye." Di heman ferhengê de bo gotinên pêşiyên ev tişt hatiye gotin: Piştî tecrûbe û çavdêriyên dûr û dirêj peyvên ku dîtî û ramanekê bi kurtebirî didin zanîn. Ji ber ku bêjêrê-wan peyvên ne diyar e, ji wan re gotinê pêşiyên hatiye gotin.


Sinorê waje û pendan diyar e

Nivîskarê Kurd Ce'fer Husênûr di hejmara 138'an a kovara Sirwe de li ser cudatiya her tiştên navborî vê nixandîne dîke: "Wexta ku ez bi karê berhevkirina biwêjên jinên mukriyanî bilî bûm heleyekê (çewtî) bala min dikişand ku her tim dubare dibû, piraniya kesên ku xwe wekî pisporê waje (biwêj) û pend (gotinên pêşiyên) dizanîn, sinorê di navbera van her du tégihan de destnîşan nedikir û ew tevlihev dikirin. Husênûr li ser mijarê wiha dom dîke: Penda pêşiyên her wekî ji nav jî diyar e, pend (şîret) ek tê de heye. Mîna "Destê be kewgîr e, çawit le feqîr e (Destê te li kewgîrê ye, çavên te li feqîr in)", "Eway le sebran e, le ser xêran e", "Şerî mar be dar".

Di sê Husênûr, pê de diçe û li ser biwêjê jî vê yekê dibêje: "Biwêj gotina bi puxte ye û tê de wateyek taybet veşartî ye, ne pend." Her wiha Husênûr balê dikişîne ser çewtiyê ku di de zanîn ku hinek metelokan jî wekî biwêj bi nav dikin, lê ew yek jî ne di cihê xwe de ye.

Li ser heman mijarê nivîskarê kurd Amed Tîgrîs jî di hejmara yekemîn a Avaşîn de nivîsek nivîsandiye. Tîgrîs jî li ser vê mijarê bihûrbînî radiwest û wiha dibêje: Ez dikarim bibêjim ku ew gotinên pêşiyên ku heta niha hatine nivîsandin û berhevkirin di hemûyan de şaşî û çewtiyê mezîniye kirin; ew jî tevlihev kirina gotinên pêşiyên û biwêjan e.

Hevalên berhevkar û nivîskar di ber-



hevkirina gotinên pêşiyên de biwêj û gotinên pêşiyên tevlihev kirine û hîn î-ro jî dikin. Bi navê gotinên pêşiyên pirtûk, berhem hatine çapkirin. Lê dema mirov li ser wan hûr û kûr difikire û lédikole, dibîne ku şaşiyê mezîniye heye, ne yek bi sedan biwêjên kurdî kirine nav gotinên pêşiyên û bi navê gotinên pêşiyên kurdan çap kirine. Wê demê çî têvelî di navbera gotinên pêşiyên û biwêjan de hene?

Piştî vê pirsê Tîgrîs li ser mijarê wiha gotina xwe didomîne: "Belê têveliyên mezîniye di navbera gotinên pêşiyên û biwêjan de hene. Eger mirov baş bifikire, dikare bi awayekî hêsanî têvelî û cudahiyan gotinên pêşiyên û biwêjan bibîne. Wek tê zanîn gotinên pêşiyên ew şîret in ku ji demeke dûr û dirêj ve di pratîkê de hatiye telesikirin û gelekî kurt in, lê di biwêjan de şîret û ders tunene. Dibe ku telesiyên wan ên bi salan jî tunebin. Ji ber wan taybetiyan tevlihevî çêdibe. Lê divê mirov ji bîr neke ku gotinên pêşiyên şîret û tecrûbeyên sed sal in. Taybetî û cudatiya herî mezîniye jî ev in."

Di nava nivîsê de Amed Tîgrîs jî bo zelalkirina mijarê hinek mînakên jî rêz dîke, em ji wan mînakên çend pêşkêş bikin.

Gotinên pêşiyên

*Agir û pîso li cem hev du nabin.

*Agir girtibû mala yekî, yê din ser û pî li ber dikizirandin.

*Av diçe avahiyê.

*Serê ku neşe kinc lê girê mede.

*Şev yek e, lê diz hezar in.

Biwêj

*Agir ber piyê wî dibe av

*Bû ava binê kayê

*Dê ev hevîr gelek avê bikişîne

*Fira kewê ye.

*Bilûla li ber ga ye.

Tîgrîs balê dikişîne ser tevliyeke din û dide zanîn ku gelek kes çîrok, gotinên pêşiyên û metelokan jî tevlihev dikin.

Her wiha nivîskarê kurd Q. Dêrsilavî ku li ser biwêjan xebat kiriye, di pêşeka xebata xwe de li ser biwêjan nixandînek kiriye, wisa xuya dibe ku ravekirina tégihê ji ferhengekê hatiye wergirtin. Lê raveya ku Dêrsilavî ji devê Serevantes dide, diyar dîke ku mijar baş nehatiye fêmkirin. Lewre gotinên Serevantes ji biwêjan zêdetir li gotinên pêşiyên tê. Li gorî veguhastina Dêrsilavî Serevantes dibêje: "Biwêj puxteya berjengekê ye ku bîngeha we ji ezmûnên dûr û dirêj digire." Her wiha tiştên Dêrsilavî di dîmahîka nivîsê de dibêje jî bi piranî li metelokan tînin. Ew dibêje: "Piraniya biwêjan bi serpêhatî ne. Yanî di pey bûyereke re hatine gotin. Çîrokên wan hene. Biwêj gotin û hevokên kurt in, lê belê wateyên wan dirêj in."

Têveliya ku Dêrsilavî dixwe navbera biwêj û gotinên pêşiyên jî bi wan peyvên tînimên: "Biwêj wekî gotinên pêşiyên ne hukmî ne. Di biwêjan de mecaz û îstihare pir e. Taybetiyeke

biwêjên kurdî jî deng-ahengî (qafiyê) ye. Biwêj li gorî serpêhatiya xwe sinorê xwe diyar dîke; hinek neteweyî ne, hinek herêmî ne, hinek bajarî ne, hinek gundî ne. Ev çarçove teng dibe, heta tê nav du mirovan. Yanê du mirov bi tenê wê biwêjê bi kar tînin. Ji ber ku biwêj gelêrî ne, pir guh li rêz û rêçikên rêzîmanî nakin. Bi gelemperî biwêj jî du an zêdetir peyvên pêk tînin. Lê belê hinek biwêjên kurdî jî hene ku ji peyveke tê holê. Lewre gava ku her du gotin bûne yek wateya xwe ya esasî jî berdana û wateyê cihê girtine. Mînak "zikreş" jî bêjeyên zik û reş pêk hatiye lê ne wateya zik û ne jî ya reş tê de maye. Wateyê bi serê xwe girtiye ku ji sîxur û nebaşan re tê gotin.

Dêrsilavî her du tégihan wiha ji hev cuda dîke: "Di gotinên pêşiyên de hukim an jî şîret hene. Lê di biwêjê de ev nîn e. Ne şîret tê de heye, ne jî hukim. Gotinên pêşiyên ezmûnên ilmî ne. Lê biwêj ne ilmî ne. Bûyêrên rojane ne. Carinan bîngeha xwe ji mîtolojiyê, carinan jî ji jiyana gel a rojane digire. Ci-vakeke çiqas zana û alim be jî ku dîroka wê kin be, biwêjên wê jî tunin. Biwêj ewil di nav dudo yan çend mirovan de peyda dibe. Lê paşê dibe malê hemû gund an herêmê."

Dema mirov bala xwe dide gotinên Dêrsilavî, tê dîtî ku ew metelokan jî di nav biwêjan de dihesibîne. Hin tiştên ku li ser ilmîbûna gotinên pêşiyên hatine gotin dûrî rastiyê ne.

Piştî van gotinan mirov dikare taybetiyên her du tégihan wiha rêz bike:

Gotinên pêşiyên:

1) Kurt in û dîtî û ramanekê bi kurtebirî didin zanîn.

2) Tê de pend û şîret hene.

3) Piştî tecrûbe û telesikirineke dûr û dirêj derketine holê.

Biwêj

1) Xweserî komekê û derdorekê ne. Pêşî li cihekî teng derketine holê û piştî li nav gel belav bûne.

2) Di biwêjan de wateyê taybet veşartî ye. Peyvên ku biwêjê pêk tînin-nikarin wê wateyê dibin der.

3) Di biwêjan de teşbîh û mecaz heye.

Hem biwêj û hem jî gotinên pêşiyên gelêrî ne. Lewre divê mirov gotinên pêşiyên û gotinên navdaran jî ji hev veqetîne. Her wekî tê zanîn gotinên navdaran ne gelêrî ne û bêjêrên wan diyar in.

Her çiqas mijara me ne ew bin jî divê mirov hinekî li ser metelokan jî raweste, lewre tê dîtî ku hinek nivîskar metelok û biwêjan jî tevlihev dikin. Di metelokan de jî wateyê taybet heye, lê metelok girêdayî çîrokekê ne. Heta mirov çîroka wê nizanibe nikare di wateya wê bigihêje. Dîsa divê mirov nifir û diayan jî ji biwêjan veqetîne.

SAMÎ BERBANG

Şehîdê yekem ê çapemeniya kurd

Cengiz Altun

Li eîhanê kuştina rojnamegeran wekî kuştina herî dijwar tê hesibandin û kes newêre qesta wan bike. Lewre raya giştî li ser vê yekê gelekî diltenik û peşîngar e. Lê li welatê kurdan, rojname bi 'guleyan' tên tekzîp-kirin. Loma li eîhanê, di warê kuştina rojnamegeran de rekor di destê kurdan de ye! Tekzîpa yekem berî vê 7 salan bo Cengiz Altun hate şandin.

Merheba Hevalê Cengiz. Berî ku dest bi nameyê xwe bikim, ji ber ku ji zû de ye min bo te name nenivîsiye, lêborîna xwe dixwazim. Min dil heye, di vê nameyê xwe de ji te re qala rewşa gel û welatê me bikim.

Erê hevalê Cengiz... Di wê rojê de, tu di dilê çil milyonî de bi lîlandinê û bi dirûsmeya "Şehîd Namirin" hatî veşartin. Wê rojê tu bûyî barana biharê û ji bo şînkirina jiyane li ser axa Kurdistanê xunivî. Gava heft guleyên mîrkujan li te ketin, ew heft sed car tirsîyan, ji qudum ketin, nizanibûn çawa birevin, lê tu wekî her carê dibişirî. Bi kuştina te dil kirin, hêvî û daxwaz, bîr û baweriyên te bişkînin. Wan dil hebû, deng û awaz û rojnameya kurdan lal bikin. Loma tu neqandî û bi qetilkirina te dest bi kuştina rojnamegerên kurd kirin. Li dû te hemdozên te rahiştin pênûs û dane ser rîya te. Qatîlên ku tu kuştin digotin qey wê bi ser bikevin. Lê gelê me bi pêxistina bîr û baweriyên te şemaqek dijwar li ser û rîyê neyaran da û dilsoziya xwe, bi dengê tîfing û bi pênûsa xwe nîşanî cîhanê da.

Di wê rojê de heftê hezar kesî bi lîlandinê, tu di hembêza xwe de veşartî û sonda dilsoziyê xwar. Lewre kurdan bi wê xwepêşandanê carek din wekî Serhildana Vedat Aydın bi dirûsmeyên xwe şemaqa mirinê li neyar dan.

Tu zanî li pey te çi qewimî? Çi pêşketin çêbûn? Ez dixwazim yeko yeko ji te re binivîsim. Lê ez di serî de hibêjim, ger ez kêr binivîsim û nikaribim qandê te xweş binivîsim, divê tu li min negirî. Lewre ez baş dizanim ku te di dema xwe de nûçeyên li ser welêt gelekî xweş dihonandin û gelek nûçeyên te di rojnameyê de bûne manşet.

Hevalê Cengiz piştî te neyaran li dijî me, di sala 1992'an de konseptek danîn. Vê konseptê ez dikarim bi gotinên Apê Mûsa ji te re vebêjim: "Zaliman ji bo me lûgatek çêkiriye/ Navê vê lûgatê danîne paqijî."

Di vê "lûgatê" de ma çi tunebû ku? Naveroka vê lûgatê ez dixwazim bi rojnameya ku tu tê de dixebitî, diyar bikim. Rojnameya Yenî Ülke li pey te hate girtin. Me di sala 1992'yan de bi navê 'Özgür Gündem' rojnameyek derxist. Lewre


hem me soz dabû te, ku pênûsa te li erdê nehêlin û hem ji pêdiviya gelê me bi rojnameyê rojane hebû. Gelê me çawa ku tu bi dîgermî hembêz kir, rojnameya xwe ji hembêz kir û tîraja rojnameyê her roj li Kurdistanê û Tirkîyê zêde dibû. Neyaran hem tehamûlê ve pêşketinê neadîkir û hem ji li gorî wê konseptê ku ji bo "paqijîya" me danibûn, dest bi çewsandina rojnameyê kirin.

Li ser vê yekê hevalên me di nava Amedê de avêtin her qesetoran. Dîsa hevalê me Yahya Orhan, Hafîz Akdemir, Hüseyin Deniz, Apê Mûsa û gelek hevalên din, di heman salê de qetîl kirin. Hevalên me yên belavkar di erebeyan de şewitandin û bi dehan hevalên me qetilkirin. Li ser ewqas çewsandinan ji me bi paş ve gav neavêt. Lewre em ne bi tenê bûn. Li dû me çil milyon kurd hebû. Piştî her êrişê, hevalên me yên din cihê wan digirt û pênûsa we li erdê nedihîşt. Neyaran lê nihêri bêfêde ye, rojnameya me bi qanûnên xwe yên ne meşrû girt.

Piştî girtina her rojnameyê me rojnameyê din deranî. Wan çiqas em di kuştin, em bi hêza çil milyon kesî dîsa radibûn ser piyan. Ez bawer im tu yê bîpîrsî: Ka çend rojname derketin û çend hatin girtin? Ez dikarim ji te re wiha rêz bikim: "Özgür Gündem", "Özgür Ülke", "Yeni Politika", "Demokrasi", "Ülkede Gündem", "Welat" û "Welatê Me".

Êdî bêcare mabûn û gotin: "Em çiqas wan dikujin, ew vedîjin lê em her car zêdetir dimirin." Çar hezar gundê me şewitandin, qîma xwe pê neanîn, navçe û bajarên me dan ber gule û topan. Peyrê çavê wan pê bar nebû, me bûsên me kuştin. Piştî ku fêmkirin bi rojnameyê nikarin, bi qanûnên xwe yên ne meşrû girtin. Lê dawiyê dane navê, fermana wê rakirin û gotin: "Divê ev rojname ji holê bê rakirin!" Hema di ser vê biryarê re çend roj derbas nebû, di 4'ê berfanbara sala 1994'an de li Stenbolê û Enqereyê bûroyên rojnameyê hilfirandin. Di vê bombekirinê de hevalê me Ersin Yıldız jiyana xwe ji dest da. Bi vê bombekirinê wan hêvî dikir ku, wê êdî nikaribin rojnameyê derxin, lê em xwedî hêza gel bûn û gel li piştê me bû. Di ser bombekirinê re rojek derbas nebû, rojnameya me çapa xwe pêk anî û bi sernavê "Ev agir dê we ji bişewitîne" gihîşt ber destê xwendevanên xwe.

Konsepta wan gelekî zerar li gelê me kir lê ew bi ser neketin. Li hemberî vê konseptê, wekî her car gelê me li ber xwe da. Di sala 1995'an de Parlemena Kurdistan a li Derveyê Welêt hate avakirin. Dîsa di heman salê de hêviya te ya ku carna te digot: "Wê ew roj bê, wê televizyoneke me jî hebe" bi cih hat. Di



Cengiz Altun, di 9'ê tîrmeha sala 1968'an de li gundê Salat bi ser Bismilê ve ji dayik bûye. Dibistana seretayî, navîn û lîseyê li Êlihê kuta dîke. Altun li Êlih, Amed û Sêrê, di girtigehê de dimîne. Piştî heşt mehên girtigehê li "Dibistana Bilind a Êlihê ya Motorê" ku girêdayî Zanîngeha Dîjleyê ye, dixwîne. Ew, di gulana sala 1991'ê de li nivîsgeha Yenî Ülke ya Êlihê dest bi rojnamegeriyê dîke. Altun, di 24'ê reşemîya 1992'an de li Êlihê ji aliyê kontr-gerila ve hate qetilkirin.

meha adarê de televîzyona me dest bi weşana ceribandîne (deneme) kir û piştî mehekê dest bi weşana xwe ya bi pergal kir.

Ez ji bîr nekim û hema bibêjim li dû te sê caran li ser daxwaza dewletê PKK'ê agirbest îlan kir. Lê li pey vê yekê, kompoyên xwe domandin. Komploya herî dawî di meha kewçêra 1998'an de li hemberî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate kirin lê ji ber ku Serokê PKK'ê zû bi vê kompoyê hesiya, ji Rojhilata Navîn ber bi Îtalyayê ve meşek da destpêkirin. A niha komploya ku serkêşiya wê DYA, Îsrail û Tirkîye dîke, gihîşt konaxeke. Li hemberî vê kompoyê gelê me li Kurdistan, Tirkîye û Ewropayê li ber xwe dide. Ev meşa giran, ku di destpêka salên

1970'yî de dest pê kiribû, hê didome. A niha meş xurtir, zehmetir û geştir bûye. An jî ez dikarim bi awayekî din bibêjim, di van demên dawîn de me mirin û azadî bêtir kiriyê bêrika xwe û li ser rîyê dinê, di nav kemîn û xafkan de dimeşin. Belê hevalê Cengiz, her ku ez dest bi nivîsekê dikim, tu û hevalên me yên din tene bîra min. Her ku navê Mizgefta Hecî Şîrîn tê gotin, tu tîyî bîra min.

Lê tu xeman nexwe wê zarokên kurdan siberoj, li ser şopa we dest bi rojnamegeriyê bikin û di welatê azad de, her ku rojnamegerêk ji dibistanê diploma xwe ya rojnamegerî bistîne, wê bizanibe ku bi keda we ya mezin, ew welat ava bûye û ew rojname hatiye parastin.

22 reşemî 1992:

Rojnameya Welat dest bi weşanê kir

Rojnameya çandî û hunerî Welat, roja 22'yê reşemîya 1992'yan dest bi weşana xwe kir.

Rojnameya hefteyî Welat ku xwerû bi kurdî bû, çih dida nivîsên bi zaravayên kurmançî, kirdkî û soranî. Rojname li Stenbolê dihate weşadin û gelek kesên wekî Musa Anter, Yaşar Kaya, Zubeyir Aydar, Abdurrahman Durre, F.Huseyn Sağrıç, Ali Yiğit, İsmail

BÛYERINE JI DÎROKÊ

Beşikçi, Amed Tîgrîs, Kemal Okutan, Nizamettin Toğuş, Dilbixwîn Dara û hwd. wekî nivîskarên quncik tê de cî digirt.

Dî çar salên temenê rojnameyê de ji aliyê dadgeha tirk ve derheqê nivîs û berpirsê karên nivîsaran de 3 doz hatin vekirin. Her wiha ji bo Berpirsê Karên Nivîsaran Mazhar Günbat cezaya girtinê hate dayîn. Rojname bi temamî heya 115 hejmaran derket. Di gulana 1994'an de weşana xwe bi dawî bû.

Welat xwe wekî berhema serhildanên sala 1992'yan didît.

Gotinên 74 sal berê, îro têne çih:

'Wê neviyên min tola min bistînin'

Serhildana Şêx Seîd di 13'ê reşemiyê de kete 74 saliya xwe. Gotinên Şêx Seîd ên 74 sal berî niha digot, îro yek bi yek têne çih, li şuna Şêx Seîdekî, îro bi sedan Şêx Seîd li Kurdistanê û çar aliyên cîhanê tedikoşin.

Wekî tê zanîn di avakirina Komara Tirkîyê de, gelê kurd, piştigiriyê mezîna dide tirkan û di avakirina Komara Tirkîyê de bi hezaran kurd têne kuştin. Serokê tirkan ê wê demê M.Kemal gelek sozan dide kurdan. Her çî qas komar a gelê kurd û tirk e, gelê kurd bi wan gotinan tên xapandin.

Piştî avakirina komarê, serokên tirk soz û peymanên ku dane gelê kurd înkâr dikin. Di demeke kurt de, bi hebûna gelê kurd ve her tiştên wê tên înkâr kirin. Ziman, çand û hunera gelê kurd tev tên qedexekirin. Li hemberî vê yekê gelê kurd gelek serhildanên mezîna li dar dixê, Ji wan serhildanan yek jî serhildana Şêx Seîd e. Serhildana Şêx Seîd di dîroka Komarê Tirk de serhildana herî mezîna e.

Berî destpêka Serhildana Şêx Seîd M.Kemal hebûna kurdan înkâr dike, wê demê Kurdistan dikeve rewşeke pir xerab. Li hemberî vê yekê rewşenbîr, ronakbîr, û rêberên kurd dest bi çalakiyên xwepêşandanê dikin.

Di sala 1922'yan de di bin serokatiya Qumandar Xalîd Begê Cibrî, parlementerê Bedlîsê Yusuf Ziya, Kemal Fevzî û Şêx Seyîd de Rêxistina Azadî tê damezrandin. Rêxistina Azadî di nava demeke kurt de li gelek bajarên Kurdistanê şax vedide. Armanca Rêxistina Azadî, di Kurdistanê de wekî rêxistineke nehênî bûyîn (ilegal) bû, lê belê dewleta tirk di nava demeke kin de bi vî rêxistinê hesiya. M.Kemal bi dek û dolabên xwe yê fenokî serokê rêxistinê, Xalîd Beg û hevalên wî Yûsif Ziya û Hecî Mûsa Beg girtin û şandin girtîgeha Betlîsê.

Piştî girtina serokê rêxistina azadî Xalîd Beg û hevalên wî, rêxistin bê se-

rok dimîne. Ji ber vî yekê, Şêx Seîd di be serokê Rêxistina Azadî. Bi girtina Xalîd Beg û hevalên wî re, serdozgerê tirk xeberê ji Şêx Seîd re dişîne û dixwaze Şêx Seîd here Bedlîsê îfadeya xwe bide, lê Şêx Seîd ji ber ku bawerîya xwe bi vî yekê nayîne, naçe. Şêx Seîd ji bo amadekariya serhildanê dikeve nava xebateke berfireh û gelek hevdiştinan çêdike.

Cûdahiyêke tevgera Şêx Seîd ji serhildanê din; tevgera Şêx Seîd di nava xwe de gelek eşîretên sunî û elwî jî bi rêxistin dike.


Daxwaza Şêx Seîd ew bû ku li hemû heremên Kurdistanê xwe birêxistin bike û pişt re dest bi serhildanê bike. Lê

belê Şêx Seîd û hevalên wî dema ji Hênê diçin Pîranê, roja 8'ê reşemîya 1925'an li wê derê rastî çend leşkerên tirk tê. Lê her çiqas Şêx Seîd naxwaze ku li wê derê bi wan leşkeran re bikeve nava şer, lê her çiqas Şêx Seîd naxwaze jî, leşkerên tirk li wê derê provokasyonê li dar dixin, li wê derê di navbera pêşmergeyên Şêx Seîd û leşkerên tirk de şer derdikeve û nêzikî 10 leşkerên tirk tên kuştin. Piştî vî provokasyonê Serhildana Şêx Seîd berî wextê xwe dest pê dike. Şervanên Şêx Seîd navçeyên Pîran, Hênê û Licê dixin bin destê xwe, di nava demekê kin de serhildan li herêmeke fireh belav dibê.


Dewleta tirk dişa bi politikayên xwe

ÇAVDÊRÎ

Nivîsa nivîskarê me nekete ber destê me



SERKAN BRÛSK



Şêx Seîd

yên osmanî hinek eşîrên kurd digire aliyê xwe û bi alîkariya dewletên împeryalist bi hezaran leşkerên xwe dişîne aliyê Amedê.

Li Amedê di navbera leşkerên tirk û şervanên kurd de şerekî giran derdikeve, hemû gelê Amedê piştigiriyê mezîna dide serhildanê. Lê belê piştî hinek eşîr alîkariya xwe paş ve dikişîne. Wê demê leşkerên tirk kincên leşkerên kurd li xwe dikin û li Amedê tolenekê mezîna pêk tînin her wiha ev dibe sedema sistbûna gel ji aliyê alîkariyê ve.

Serhildana Şêx Seîd pêşiyê li Amedê têk diçe, piştî jî hedî hedî li herêmên din. Piştî van tekçûnan Şêx Seîd leşkerên xwe paşve dikişîne. Lê mixabin roja 27'ê avrêla 1925'an Şêx Seîd û hevalên wî, li nêzikî bajarê Mûşê bi destê çahşekî dikevîne xefîkê û ji aliyê leşkerên tirk ve dil têne girtin. Roja 30'ê pûşpera 1925'an Şêx Seîd û 48 hevalên wî li Amedê têne dardekirin.

Serhildana Şêx Seîd her çiqas bi tekçûn bi dawî bibe jî, di dîroka Kurdistanê de cihekî taybet digire û ronahiya xwe dide serhildana îro ya nûjên. Serokê Serhildana Şêx Seîd li ber sêdare wiha gotibû: "Min ji bo mafê gelê kurd dest avet çêkê, ez ji ber vî yekê jî tu carî ne poşman im. Ez mirinê ji xwe re wekî şeref dibînim. Bi dilekî pak û hêsa diçim nav şehîdên kurdan, lewre, ji 4 milyoni bêhtir kurd bêguman dê tola min bistînin." Ev gotinên Şêx Seîd 74 sal berî niha digot, îro yek bi yek têne çih, li şuna Şêx Seîdekî, îro bi sedan Şêx Seîd li Kurdistanê û çar aliyên cîhanê tedikoşin û di rîya şehîdê kal de dimeşin.

DAVUT MIZGÎN /A.WELAT ÎZMÎR

Çavkanî: Dîroka Kurd û Kurdistanê: Amed Tîgrîs-Aso Germiyani

Endamê Komîteya Navendî yê PKK'ê Osman Öcalan: KT nikare hesab bipirse, dê he



Ji Komîteya Navendî ya PKK'ê Osman Öcalan û Cemil Bayik rojên 16-17'ê reşemiyê beşdarî bernameyê MED-TV bû û li ser komploya li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan nixandineke berfireh kir.



Piştî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi komplooyeke navneteweyî hate dîlgirtin, li ser navê Komîteya Navendî ya PKK'ê Osman Öcalan roja 16 reşemiyê bo raya giştî daxuyaniyek ragihand. Öcalan di bernameyê MED TV'ê de axivî û helwesta Tirkîyeyê û hevalbendên wê, wekî "korsaniyêke navneteweyî" bi nav kir û da zanîn ku welatên ewrûpî bi awayekî rezilane tirin tevgeriyane. Öcalan wisa axivî: "Serokatiya me bo aştiyê hate Ewrûpayê. Serokatiya me, li ser navê gelekî ku fermana wî hatiye rakirin û ku li dijî vê fermanê ji tiştêkî xwe nade alî, destê xwe yê aştiyê dirêjî mirovahiyê kir. Lê kesên ku doza mafên mirovan û demokrasîyê dikin, bi wî destê aştiyê berfireh kir. Berevajî vê

yekê, li ser pêwendiyên gemarî û li dijî pîvanên hiqûqî yên navneteweyî, ewrûpîyan Komploya 9'ê Kêwçêre gihand qonaxêke din. Diyar e, ev komplo, di kesayetiya Serokatiya Neteweyî de li dijî gelê kurd hatiye girêdan. Ev hêz, ji me hêvî dikin ku, em wekî mihên ku li ber qasab serê xwe datînin, stûyê xwe bo komkujiya dewleta tirk deynin ber kêrê. Ev yek gelekî eşkere ye. Ne hewce ye ku mirov bi awayekî dûvedirêj şirove bike. Xuya ye, gelê me divê li van hêzan vegeêrîne. Azadî, bi şerê li dijî berjewendiyên împeryalistên dê pêk were. Berî her tiştî divê em vê yekê baş bibînin: Împeryalistan daxwaza gelekî ya bo azadî û aştiyê kir gorî û qurbanê berjewendiyên xwe."

Di dirêjahiya daxuyaniya

xwe de endamê Navendî ya PKK'ê li ser tevgera gelê jî axivî. Öcalan her çar parçe ka hanê, gelê kurd Serokatiya xwe, dê xurt û gurtir bûna da xuyakirin ku maf heye bi şer mirovane bijî. Mafî ji dest wan

Osman Öcalan bal kişand ser grotiya Abdullah Öcalan Serok Apo gelê û gelê kurd divê rokatîya Neteweyê dewleta tirk bibe. Öcalan wisa berdewam me teqez dê ew dewleta tirk papê her kurd li gorî amade be. Ji bo welêt û metropol laka meşrû ye. Kan li gorî vî tandin. Li ber serê xwe nativ re şer dike."

Wekî din, kişand ser xwe, dijmîne Öcalan ji bo rûpayê jî dijî bilî çalakîyên kurd her cure pêk bînin.

Di sa Osman helwesta Amerîkê

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Cemil Bayik:

Hevgirtina me ji her demê xurtir e

Di sa endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Cemil Bayik jî roja 17 reşemiyê beşdarî bernameyê MED TV bû û li ser rûdanên dawîn axivî. Bayik, der barê komployê de bal kişand ser Peymana Washingtonê û da zanîn ku piştî vê peymanê meşandina komployê ne tesadûf e û ev komplo dê li dijî hemû gelên Rojhilata Navîn berdewam bike. Cemil Bayik her wiha bang li dewletên ewrûpî kir û got ku ger ew ji bo Serokatiya wan wezîfeyên xwe bi cih neyînin, ew guh nadin tu rêz û rêçikên navneteweyî. Bayik wisa axivî: "Kesên ku bi tevgerên korsanî

hemû rêz û rêçikên navneteweyî bînpê dikin, nikarin ji me vê yekê bixwazin."

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Cemil Bayik bal kişand ser şerê kurd û tirkên jî û got ku heya îro Serokatiya wan ji bo şerê kurd û tirkên rû nede, gelekî li ber xwe daye lê dema bi vî awayî biçê, ew jî nikarin rê li ber vî şerî bigirin. Bayik axaftina xwe wiha berdewam kir: "Serokê me ji bo ku şerê kurd û tirkên rû nede, gelekî li ber xwe da. Niha jî partiya me ji bo vê yekê dixebite. Lê ev yek êdî ji hêz û karîna me jî dibore."

Li aliyê din Bayik bal kişand ser çalakîyên Kurdistanîyan ên li Ewrûpayê û got ku divê nekevin. Lewra dijîmin li keysa xwe digere.

Bayik li ser tenduristiya Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan jî rawestiya û got ger tiştêkî herî biçûk bi serê wî bê, kes nikare li ber wan xwe ragire. Bayik li ser rewşa PKK'ê wisa axivî: "Partî, enî û artêşa me li ser piyan e. Bila kes qet xeman nexwe. Lewre Serok Apo dûrebîn bû û amadekariya van rojan kiribû. Hevgirtin û yekîtiya partiya me ji her demê xurtir e."

Ji bo protestokirina komploya li ser Öcalan, li Kurdistan û Tirkiyeyê kurd rabûn ser piyan



Dîmenek ji bûyerên li Taxa Gaziye ya Stenbolê

Imperyalîstan pîma kurdan kişand

Piştî ku anîna Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hate ragihandin, li Kurdistan û Tirkiyeyê gel rabû ser piyan. Li gelek deveran ji bo protestokirina tirkiyeyê gel li kolanên bend danîn û gelek erebeyên saziyên dewletê hatin şewitandin.

Amed

Li Amedê çalakiyên pêşin roja 16'ê reşemiyê danê nivro rûdan û danê êvarê jî bi awayekî gurtirîn domiyan. Li Amedê girtiyê PKK'eyî Mazlum Öncel, welatparêzê bi navê Kahraman Denli, Bilal Ekinci û kesekî bi navê Ehmed agir berdan canê xwe. Piştî ku ev çalakî jî aliyê gel ve hate bihîstin, ciwanên kurd li kolanên Amedê dest bi meş û çalakiyan kirin. Ji ber gur û geşbûna çalakiyan, li ser listeya ku Muduriyeta Emniyeta Amedê amade kiribû polîsan avêtin ser gelek malan. Di van êrişan de bi sedan kes hate binçavkirin.

Li aliyê din li Amedê şaxên HADEP'î jî aliyê polîsan ve hatin dorpeçkirin. Roja 16'ê reşemiyê polîsan parêzer Sinan Tanrikuli, Selim kurbanoğlu, Abdullah Akın, Mahmut Vefa û Mansur Reşitoğlu û her wiha serokê bajara Amedê av. Feridun Çelik jî di nav de gelek rêvebirên HADEP'ê hatin binçavkirin. Li hêla din pankartekî bi bombeyê barkirî li Tek Kapiyê li sûrên Amedê hate dalikandin. Li ser pankartê: "Em girtina Serok Apo şermezar dikin" hatiye nivîsîn.

Wan

Li Wanê roja 16'ê reşemiyê piştî nivro li taxên bi navê Xaçort, Xelîlaxa, Şamrالنالتى, Eski Kale Yolu û Bostaniçi gel kom bi kom çalakî pêk anîn. Li Xaçortê li dora 2 hezar kes li hev civiya û sloganên wekî

"Bijî Serok Apo", "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok" qîrandin. Çalakî bêyî mudexelaya polîsan çû serî, lê piştî çalakiyê polîsan Xaçort dorpeç kir. Ligel dorpeçkirinê jî çalakî pêk hatin.

Dîsa li taxên wekî Seyit Fehîm, Cevdet Paşa, Hatuniyeyê jî çalakî qewimîn. Polîsan bi panzeran avêt ser çalakiyên Karşıyaka, Cevdetpaşa, Hatuniyê û hin xwepêşandêr derdest kirin. Li aliyê din li Şahbağê û Beyözümü du dibistan hatin şewitandin.

Dîsa roja 17'ê reşemiyê xwendekarên Lîseyaya Kazım Karabekir, Atatürk û Cumhuriyetê li hev civiyan. Di demeke kurt de hejmara xwendekaran gihîştê 300 kesî. Van xwendekaran xwest xwe bigihêjin xwendekarên Lîseyaya Erekan. Lê polîs avêt ser xwepêşandêran û pevçûn derket. Di vî navberê de xwendekarên Lîseyaya Erekanê jî bi polîsan re şer kirin û sloganên wekî "Bijî Serok Apo" avêtin. Her wiha gel jî li berbanan(balkon) bi çepikan piştigiriya gel kir.

Batman

Li Êlihê polîsan li gel reşand. Li Êlihê jî gelek deveran gel bi girseyî rabû ser piyan. Gel danê êvarkî li Taxên Yeşiltepe û Huzur li hev civiya û heya derengiyê şevê li dora êgir dîlan gerand. Li aliyê din polîsan li Taxên Bağlar û Sağlık tedbirên gelekî dijwar wergirtin. Dîsa gel roja 16'ê reşemiyê danê êvarkî li Taxa Beşevler li hev civiya, agir dada û slogan qîrandin. Piştî ku hejmara gel zêde bû, polîsan berê xwe da girseyê û li girseyê reşandin. Dîsa li Taxa Petrolkentê jî li agir dada û sloganên wekî "Bijî Serok Apo", "Bi can bi xwîn

em bi te re ne ey Serok" û "Destên qeste Serok bikin dê bêne şikandin."

Li aliyê din li girtîgeha Batmanê girtiyaya PKK'î Arzu Demiralp agir berda canê xwe û birîndarxedar bû.

Wekî din HADEP'a Êlihê, KESK û İHD'ê hate dorpeçkirin. Her wiha li Gundê Nû, ku bi ser Kozlukê ve ye, gundiye bi navê M. Sait Aslan ji ber girtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi nexweşiya dilket û jiyana xwe ji dest da.

Riha

Li taxa Eyûbiyê li dora 600 kes li hev civiya û çalakiyêke protestoyî pêk anî. Çalakiyê bi qasî niv saetê dom kir û sloganên wekî "Bijî Serok Apo", "Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok" hatin qîrandin.

Qoser

Li Qoserê polîsan ciwan û zarokên ku çalakî pêk anîn binçavkirin. Li gorî ragihandinan zarokên ku hatin binçavkirin 6-7 salî ne. Her çend zarok serbest hatine berdan jî, ciwan hîna di binçav de ne.

Ji bilî van çalakiyan li bajarên Tirkiyeyê ên mîna Stenbol, Edene û Mersînê jî çalakiyên girseyî pêk hatin.

Li aliyê din li Kurdistan û Tirkiyeyê digel girtiyên PKK'yî, girtiyên rêxistinên şoreşger ên Kurdistanî û Tirkiyeyî jî ji bo piştevaniya Öcalan ketine greva birçibûnê. Her wiha roja 15'ê reşemiyê girtiyê ji doza TKP(ML) Nurhak Polat ji bo protestokirina dilketina Öcalan bi armanca piştigiriya înternasyonalist agir berda canê û jiyana xwe ji dest da. Dîsa girtiyê PKK'yî yê bi navê Yahya Figan jî li Girtîgeha Ümraniyeyê agir bi bedena xwe xist.

NAVENDA NÛÇEYAN

ab bide



rawestiya û da zanîn ku her çend wan nexwestiyê şerê van her du dewletan bikin jî lê wan her ku çûye dijminatîya xwe diwartir kiriye. Öcalan her wiha qala helwesta Yewnenistanê jî kir û got ku Wezîrê Karên Derve yê Yewnenistanê heqeret li gelê kurd kiriye û divê ew lêborîna xwe ji serokatîya wan û gelê kurd bixwaze. Osman Öcalan ji bo gelê yewnanî jî wisa axivî: "Gelê yewnan gelekî têgihîştî û bîrewer e, lewre hay ji hêjahiya dostaniyê heye. Em hêvîdar in dê gelê yewnan nabe destikê dek û dolabên hikûmeta yewnan."

Li layê din Osman Öcalan bal kişand ser darizandina Abdullah Öcalan jî û diyar kir ku bi tenê dadgeheke navneteweyî dikare wî bidarizîne. Öcalan wiha dirêjahî da axaftina xwe: "Tekane hêza ku hesab bide, dewleta tirk ya komkuj û zordar e. Bes gelê kurd dikare jê hesab bipirse. Em dê tenê pî bidin ser vê yekê. Êdî tu rayedarên tirk nikarin li mala xwe rehet razên. Ew dê piştî demeke kin diyar bibe. Ku PKK'ê neke jî dê gelê kurd vê yekê pêk bîne."

Osman Öcalan wiha dawî li daxuyaniya anî: "Li ser vî binçavîya dirûsmeya tekane ya partî, artêş, enî û gelê me ji bo serkeftinê, serkeftinê, serkeftinê. li pey rîya Serok Apo her û her bimeşin."

Helbestine bo ROJ'ê hatine honandin:

Senfoniya Evîna ROJÊ

Bê te nabe

Bê te nabe
stêrkên berbangê
li asîman kom bi kom
diçilwilin reng bi reng
lê bê te naçin ava
naçin da ku bibe sibe

Sibe
qet bê te nabe
dengê dîkê sibê nayê
mele bangê naxwîne
bê te beyan zelal nabe
ne jî roj hiltê

ROJ
ku roj derdikeve
ku cihan ronak dibe
jiyan ji bo çi ye?

Belê jiyân
jiyan bê te qet nabe
bê te mirin jî zehmet e!

Her tişt bi te re çêbû
stêrk bi te re geş bûn
Hîv bi te re ronî bû
roj bi te re hilhat

Ey ROJ
ROJ'a Welat
te da cihanê
fikir û ramanê felatê
di kenê dayikekê de
di çavên keçikê de

Te dilê dayikan germ kir
keç bi êgir şa bûn
pê re listin di quncikên tarî de
keç bi êgir re zewicin
Xortan li dora êgir dilan girt
hinekan agir fir kir
mîna şerbata daweta xwe

Zarokan gulên ji êgir
çandin di mêjiyê xwe de
gul bûne Zehra
Zehra bû gul

Bê te qet nabe
Jiyan jî mirin jî

HARBÎ SOYLU

Em tèn

Em tèn
Em tèn...
Ref bi ref
Qor bi qor
Bi gavên ewle
Bi hemû mêr û mêrxasên xwe
Em bi şev tèn

Bi ro û nîvro tèn
Em tèn ma xebera we hebe!
Em li her derê ne
Li ser çiyân

Li deştan in
Li kolan û sûkan
Li derveyî Welêt
Li ser rûyê hemû cihanê
Em tèn ma xebera we hebe!

Bi xort û keçên xwe ve
Wekî Çemê Feratê diherikin û
dixuşuşin tèn

Bi dilan û govend ji çiyân dadikevin
deştê

Her yek ji me bûye volqanek
Dil û ceger li me hatine sotandin
Em tèn

Bi eşqa Mazlum, Hayri û Kemal tèn
Em ji nava zilm û zordariyê tèn
Xortê me ter û teze

Keçên me bi ser xêlî xwîna xwe li ser
wê axê rijandine

Em pêlê wê axê pîroz dikan tèn
Tirs û xofê girtiye ser dijmin
Em ji êgir çêbûn

Em agir in
Em ji Zindana Amedê
ku bi hestiyê şehidên me hatiye
çêkirin tèn

Em ji goristanên bênav tèn
Em ji bo Şêx Seîd û Seyid Riza tèn
Em ji Newala Qeseban tèn

Em neteweyek in
Em rabûne ser piyan
Li hespên qir û kumet siwar bûne
Wekî ba û birûsk vedin, li her çar
aliyê Kurdistanê

Em tèn
Em tèn
Em tèn, ma xebera we jê hebe!

HESENÊ ALLÊ

Senfoniya Evîna ROJÊ

Heval lêdanên dilê te
Senfoniya evîna Rojê ye
Şewata cergê te
Awaza hêrsa tolê ye
Bangîna çavên te
Peyman şerê min e

Heval
Kezeba te pêta agir e
Serî hildide
Bi bedena hovîtiya tariyê dikeve
Porê Rojê yê zer diparêze

Heval
Reşikên şevê yên bêbext
Em ji hev bi dûr xistin
Êşa hesreta dûrketina ji te
Bedena min pêça
Ferqa nava rihê min û te jî
Bû mîna pêl û behrê

Heval
Te singê evîna xwe
Ji min re vekir
Min ji Ava Heyatê vexwar
Lê ez têr nebûm
Ji şerîniya eşqa te

Heval
Tu pirtûka jiyana min î
Her rûpelek jê
Bîranînên dilê te
Tê de nivîsiye
Her gotinek
Bi tiliyên êgir ê zirav
Û ji şewata cergê te
Hatiye lêkirin

Heval
Tu qibla min î
Çira hêviya çavê min î
Stêrka şeva min î
Şewqa heyvê ye
Di tariya jiyana min î
Çirûska hinava min venemiriye
Xewna pêşeroja min î

Heval
Ta ku azadî
Bipişkive
Li ser lêvên kulîlkên biharê
Ta ku kenên hêviyê
Bibiriqin
Di çavên jiyane de
Ta ku tîrêjên ROJ'ê
Şaxên xwe berdî cihanê
Evîna me abadîn e
Erê erê Heval
Bi tîna germa
Eşqa dilê te
Leşkerê Ehrîman
Şewitîn
Şerpezebûn
Li ber şewqa Ronahiya ROJ'ê
Ewrên tarî
Perçe perçe bûn
Reviyan
Bê ku li paş xwe mêze kin
ROJ li asîmanê mirovatiyê
Ta dawî dibiriqe
Û

"Kes nikare ROJA ME Tarî Bikel"
MEHMED MEHMED



Li Navenda Çanda Mezopotamîyê ya Stenbolê

● 20.02.99 şemî: Konserta Koma Améd, saet.17.00, cih: N.C.T.

● 21.02.99 yekşem: Gulên Mezrobani Teatra Jiyana Nû, saet.14.00, cih:

Hadiş Bağolar

NÇM İzmir

● 20.02.99 şemî: Konserta Koma Agre, saet.17.00

● Konserta Koma Agre, saet.15.00

● 26.02.99 în: Konterana "Pîşgîrîka hevkarîyê" ya kurdan û

împervalkîm, Ragîm Zarakou, saet.18.00

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



YÇKM

● 20.02.99 şemî: Fîlm 'Qutîka Muzîkê', saet.16.00

● 21.02.99 yekşem: Seminera li ser însan û tendurustiyê- "Hepalî"

Beşdar: Dr. Altan Yalçiner, saet.15.00

● 26.02.99 în: Fîlm "Li cem min bûnî" derhener: Rob Bawner,

saet.19.00

T.K.M.

● 21.02.99 yekşem: Gotûbêj- "Tivatroya politî" Beşdar: Oktav

Güzeloğlu-Hasmet Zevbek, saet.15.00

Çend demên dijwar li ber MED-TV

Roj 15'ê reşemiyê roja sêşemê ye. Wekî her car me li aramgehê dikirî rojnameyên wê rojê bixwînin. Bi rûnîşînê re hevaleyê dipirse 'te nûçeyên dawîn bihistine?'

Dewleta faşîst bi hevkarîya împervyalîstan serokê gelekî, ronahîya bi hezaran însanan revandiye. A dijwartir ew anîne welatê dewleta faşîst, bê îman Tirkîyeyê. Bi şev saet di 03'yan de gihîştibûn ser axa dewleta ku bi fen û fûtan hatiye avakirin.

Bi bihistina van nûçeyên bê wext, ne lirê em hemû li ber televîzyona Medê ne. Em naxwazin jê bawer bikin. Em dixwazin ku wekî her nûçeyên wan ên din, ev nûçeya wan jî derew be. Komandoya televîzyonê di destê hevaleyê de ye.


Di wê navberê de ev deng derdikevin. MED TV niha nabêje heya agahiyên fermî nestîne, nûçeyine din veke' here ser televîzyonên biyan ka ew çî dibêjin', 'kanala Yewnan veke', û hwd.

Lê tenê cihê bi bawer Med e. Dîsa tê ser Medê. Bi çar çavan em li benda nûçeyan in. Ji bê emê çav û guhen xwe têxin nav ekrana MED TV. Çav li televîzyonê guh li derve gelo ji deverê tu deng tê an na?

Belê Med jî nûçeya ne ba dide. Ew nûçeyê ku li ser rûyê erdê tu kes naxwaze tişteki bi vî rengî bibihîze. Nûçeya ku wekî hinek misînek ava germ bi ser serê mirov de dake. Bi carekê re qurûm û qidam dişikên. Lê cesaret nasîkê û hêvî heye.

Gava ku spîkera MED TV van nûçeyan pêşkêş dika, ji van dewletên hirç û hov, dewletên hevkarê vî kirinê re meydanê bixwîne, bi dengê ku bibêje 'emê we poşman bikin', bi awireke tûj û hêrsbûyî, lê di awiran de ceger û ji xwe bawer bûn heye. 'Hûn serokê me jî birevînin, wê bi milyonan kurd doza xwe bernedin'. Bi tu awayî tirs di wan awiran, di wê awaza nûçe xwedî de tune ye.

Belê telefonên Kurdîstaniyan qut nabin. Telefon li ser telefonê tên. Ji heft salî heya heftê salî. Ji Başûr, Bakur, Rojhilat, ji vî aliyê dinê heya wî aliyê dinê telefonên bo protestokirina sûcdaran û hevkarên wan tên. MED TV hest û dilînen van zarok, jin, mêr, pîr û kalan hemûyan bi hev dide hesandin û fêmîkirin. Dayîkek wiha dibêje: "Bila TC bib-



hize, bila Ecevit bibihîze, du şehîdên min hene du lawên min gerîla ne. Tişteki bi wan were, ezê ji herim bibim gerîla. Bila nebêjin ku me serokê wan girt û wê ji hev belav bibin, wê dev ji doza xwe berdîn. Bila nebêjin emê wekî serhildanên din vî serhildana wan jî tîk bibin, bila vî zanibin ku îro her yek ji me Apoyek e. Apo li her deverê ye".

Dîsa navenda nûçeyan, dîsa agahiyên protesto û serhildanên Kurdîstaniyan.

Biryardariya ciwanan jî tê ser ekranên MED TV. Ew ciwanên ku gava bar hilgirin êdî tu hez nikare wan ji riya wan vegeirîne; "Bi can bi xwîn em bi te re ne ey Serok!" Ew hemû balyozxaneyên ku navê wan bi tawanbarîyê derketiye îşgal dikin. Li hemû parzemînan.

Ew ciwan li bakur, başûr, rojhilat û rojavayê dinyayê, derdê xwe digihêjin reyedaran, xwe didin naskirin, bi politîkî û zanabûn wan rayedaran ji aliyê erênî ve dixîne tevgerê.


Ev qîrînen ji çar aliyên dinyayê dihatin bi saya MED TV hemû kurd dikirin yek parçe, yek laş. Gişan li hev û din guhdarî dikirin, ji gotinên hev û din ji xwe re tişt digirtin, dibû sedema bêhtir zanabûnê. Wekî Dr. Î. Beşîkçî dibêje: "Kurdîstan ne Kurdîstana berê ye. Çanda siyasî zêde dibe. Hêvî û daxwazên Ehmedê Xanî piştî 300 salî bi cih tên û digihêjin rastiya xwe".

Ev diln û fikirên li jorê, yê bîstikeke dijwar, di temaşekirina MED-TV' de bûn.

EVİN RONÎ

TÎŞK

Hewlekanî gorankarî le Irak û kurd



BEKİR ŞIVANÎ

Perlemanî Kurdistan le Derewey Welat (PKDW) ke mangî nîsanî salî 1995 le şarî Den Haagî Holanda hate damezirandin, her le seretay dest be kar bûnewe, kewtê hewlî kokirdinewey hêz û layen û kesayetiye kurdîyekan le jêr sêberî organêki neteweyî weha da ke bitwanê parêzgarî le berjewendîyekanî gelî kurd bikat û rê xoş bikat bo yekgirtin û neheştinî towî duberekî û nakokî nêwan kurd. Be wata organêki pêkhatû le niwêneranî parte siyasîyekan û rêkxrawe komelayetî, kulturî û Ayîniyekanî Kurdistan. Xemxoran, paş çawgêran be ezmûnî gelan da, bîrokey damezrandinî Kongrey Neteweyî -yan hênaye arawe.

PKDW zor baş deyzanî ke mewday dîrî nêwan layenekanî kurd debête gewretirîn tegerey ser rêy damezrandinî organêki neteweyî. Belam legel eweş da kolî neda û şan be şanî hêze niştîmanperwer û kesayetiye kanî kurd destî kird be rakêşanî pirdî peywendî legel hêze siyasîyekan û kesayetiye welatparêz û niştîmanperwerekanî sertaserî Kurdistan. Le encam da, diwa mangî salî 1997 le şarî Bruksel, kobûneweyekî berfirawan bestra û lew kobûneweyê da komîtey amadekar hate helbijartin. Em komîteye le kobûnewey kotayî salî rabirdû da, be koy deng biryarî da ke be layenî kem ta Newrozî salî 1999 damezrandinî Kongre bête rageyandin. Ta êre birhênaneweyekî kurd bû sebarete be hewl û teqelakanî yekxistinî rîzekanî gelî kurd le organ yan rêkxraweyekî neteweyî da. Belam be çawxîşandin be doxî aloz û nahemwarî Kurdistan û peywendî şiloq û nacêgirî nêwan hêzekanî kurd, çend pirsîyarêk rûberûy mirov debînewe.

Babetêki serekî ke nişaneyekî gewrey pirsîyar le serî rolekanî gel da dirust dekar, hoy beşdar nebûn û xo be dîrgirtinî hendê le hêze serekîyekanî Kurdistan e le hemû core karêki kurdî hawbeş. Helbet komîtey amadekar bîrî lem kêşeye kirdotewe û be tegereyekî rasteqîney dadenê, belam be rêgir le qelemî nadat. Bêguman komîtey amadekar be niwêneranî partekan û kesayetiye serbexokanewe, lew bareyewe amaje deken bo ezmûnî gelanî tîrî cihan û radegeyenin ke hiç gelêki bindest le yekem hengaw da neytiwanîwe şaxî nakokîyekan text bikat û towî yekêti neteweyî biçênê. Emoş xoy le xoy da bîrkirdineweyekî hawçerxane ye û ew aste nişan dedat ke karî hawbeşî kurdî pêy geştîwe.

Diway rageyandinî damezrandinî Kongre, erkî ziyatir dekewête serşanî beşdaran. Wekî pêwîst debê Kongre le peywendî berdewam da bê legel hemû ew hêz û kesaney ke le qonaxî yekem da beşdar bûniyan ret kirdotewe. Reng e ew layenane lem qonaxe da hengê tîbînî xoyan hebê ke lem kate da le karî kurdî hawbeş be dîriyan degre. Belam siruştî em tîbînîyane herçonêk bê nabê heta kotayî mayey ziyar geyandin bê be berjewendî gelî kurd û xebat û tîkaşî le pêwanî yekêti û azadî da. Bêguman berdewamkirdinî peywendî le nêwan herdû berey legel û dij be kongre, pêwîst be pişûdirêjî û bîrî wîrdî hemû layek dekar.

Hendê pirsîyarî tîrîş ke lem qonaxe da sebarete be Kongre dene arawe, her zadey ew doxe nalebare ye ke gelî kurdî parçekiraw û bizûtnewey rîzarîxwazî em geley pêda tîdeperê. Be leberçawgirtinî dabeş bûnî Kurdistan be ser çîwar parçe da û hebûnî bizûtnewey rîzarîxwazî le her parçeyek ke eger çî be qewarey çîyawazîş bê, ew pîrse dîdnête gorê ke aya Kongre paş damezrandinî detwanê bibê be organêki karîger le jîyanî siyasî kurdî da, yaxud to bilêy Kongre bitwanê piştîgirî layene karîgerkan û kesayetiye kanî kurd be dest bîne û bibê be hokar û hewênî yekgirtinewey kurd û legormanî duberekî bo heta hetaye. Helbet welamî em pirsîyarane û çendîn pîrîş tîrîş çende bende be wîst û arezûy kurd xoyewe, ewendey bende be gorankarî û pêşkewtînekanî ayînde le Kurdistan û herêmeke û çîhanîş.



Serhildana Serok a pêşîn

malê ji xwe re holikekê çêdike û li wê holikê çiqas firsendê dibîne, pirtûkan dixwîne. Ji bo ku vî ciyî çêbibe Serok pir kedê dide.

Rojekê birayê wî yê biçûk tê nava bexçe û ew him bexçe û him jî holika Serok xera dike. Li ser vê yekê Serok gelekî hêrs dibe. Lewra, wî bi keda destên xwe û bi xwêdana eniya xwe ew cî çêkiriye. Serok bi kevira dide pey birayê xwe û ew jî direve...

Li ser vê yekê, bavê Serok jî bi keviran dide pey Serok. Lê Serok jî li ber xwe dide. Ji bo ku mafdar e, bi bavê xwe re şer dike. Paşê bi dizîka tê malê. Ji bêrika bavê xwe deh banqinotî derdixe û ji gund dertê. Serok ji mal direve û diçe Nizîpa Dilokê. Li wir li nav geniman dixebite. Demek şûn de Serok tevî deh banqinotan vedigere mala xwe.

Serok ji vê bûyerê re dibêje 'Serhildana Pêşîn'.

Gelî hevalan, divê em ji vê serpêhatiya Serok dersên mezin derxin. Serok hê di wî temenê xwe de neheqiyê qebûl nake. Ji ked û xebatê pir hez dike. Hurmeta wî jî ked û xebatê re heye. Vê yekê jî her kesî dixwaze.

Hevalno!

Zarokek bixwaze ku bêkar û bêxebat bijî, wê têkeve riyeye nebaş. Ew kesê ku ji mirovên kedkar re rêz negire, wê bibe mirovekî nebaş. Ma îro ev şerê me jî ne li dijî mirov û hêzên nebaş e? Şerê me li dijî vî dijminê kedxwar e. Wê demê divê em xebatkar bin. Bi ked û xebata xwe bijîn. Û li dijî neheqiyê em li ber xwe bidin. Mîna Serok Apo...

BAGER BARAN

/GIRTÎGEHA ÛMRANIYÊYÊ

Hevalno! Serok Apo jî demekê mîna me zarok bû. Lê dema ku ew biçûk bû, gelek tiştên girîng dît û derbas kir. Mezinahiya Serok hê di wê demê de xuya dikir.

Her tiştê ku di serê Serok Apo re derbas bûye, ji bo me bi dersên

mezin tijî ne. Ji bo vê jî divê em biçûkatiya Serok baş bizanibin û dersên baş derxin.

Serok li gunde xwe Amara, bi xebata xwe tê naskirin. Ew, ji serê sibê heya êvarê li nav bexçeyan dixebite û kar dike. Serok hê di neh saliya xwe de, li nav bexçeyê

WERIN EM BI MORÎK BILÎZIN

Ji bo listina vê listika bi navê 'Morîk' herî hindik pêwîst e du kes hebin. Gava cihê ku lê bê listin ji axê be, pêşî kortikek bi darikan an bi tiliyan tê vekirin. Ji bo diyarkirina kesa yekemîn pêşî bi du morîkan tê despêkirin. Listikvan morîkan datîne serik (bo cihê morîk jê tê avêtin serik tê gotin). Listikvan bi tiliya xwe ya navê morîkan ji serik diavêje. Kî pêşî morîkê an morîkan têxe kortikê wê ew pêşî dest bi listinê bike. Listikvan dikarin di ser du kesan re bin, sê, çar, pênc û pirtir jî dibe. Ji ber ku bi dorê tê listin.

Listik ji aliyê hejmara morîkan ve jî yeko-yeko, dudu-dudu û hwd. tê listin. Wekî mînak em bêjin sê kes wê bi hev re bilîzin û wê dudu-dudu bilîzin. Her yek du morîkan datîne serik û ya dora wê tê, morîkan ji serik bi tilîka xwe ya navê, diavêje kortikê (wekî avêtina xarê). Listikvan morîkên ku bi cara yekemîn re neketine kortikê, dikare ducar bike. Heya di xistina kortikê de bi ser bikeve, heya qedandina wan morîkan dikare berdewam bike. Dora wê he-

ya ku van morîkan bixe kortikê berdewam dike. Kesê ku morîkê nexer kortikê 'dişewite' û dor derbasî yekî/ê din dibe. Her wiha gava ku listikvan bi fen bilîze, yanî destê xwe bi erdê re bikişîne, ji ber ku wî çaxî xistina morîkê bo kortikê hêsantir dibe, yan jî listikê tê derxistin yan jî dora wê kesê 'dişewite'. Lewra wekî hemû listikan bi fen, yanî bêked bide xistina morîkan û li derveyî quralan listin, nayê peji-randin.

Belê gava me ev listik dilîst em 6-7 salî bûn. Bi piranî me li derve dilîst, lê gava ku derve sar bû, yan li ber tenûrekê, yan di bin berqefekê de me dilîst. Her wiha li hundirê malê jî li ser cil mirov karibû bilîsta. Me kortik û serikê xwe li gorî xetên merşê diyar dikir. Belê ez bawer im pir caran wekî min we jî di xewna xwe de ditiye. Min jî di xewnên xwe de gelek caran didît ku dawa min ji morîkên biruqonkî, ên spî, ên sor, ên şîn, ên heqîqet, ên mircan, ên qiristan tijî ye.

HEVALA WE EVÎN

JI ZAROKAN

Ez zaroka Kurdistanê me

*Ez zaroka Kurdistanê me,
çiyayên min hene
Agirî, Sîpan, Bagok û Cûdî,
Ez zarokê Kurdistanê me.
Tu zarokê Kurdistanê yî,
hevalên me hene*

*Mazlûm, Egîd, Kawa û
Zilan*

*Em zarokên Kurdistanê ne
Welatê me heye
Navê me Kurdistan e,
Em zarokên Kurdistanê ne.*

*Nazê Eldemir
(Gulên Mezrabetan)*

Azadî

*Ez kesk û sor û zer im
Ez welatê xwe dixwazim
Ez kesk û sor û zer im
Ez Kurdistanê dixwazim.
Ez dixwazim welat,
Ez kesk im, sor im û zer im
Ez Kurdistanê dixwazim
Ez gula Mezrabetan im
Aştî û serfiraziyê dixwazim.
Ayşe Güleç-Selda Balta*


Jiyan û aştî

*Li çiyayên Kurdistane
Em zarok kulîlk in
Kulîlkên kesk, sor û zer
Ber bi aştîyê de em baz
didin.
Baz didin ku aştî were
Baz didin ku azadî were
Baz didin ku biratî were
Baz didin ku jiyan were.
Rozerîn Salik*

Homara Kovara DERSİM'î a 9'în veciya

Homara 9'în ê Kovara Komeleya Çand û Paştgirotinî ya Dêrsimî-yan vejiya. No kovare hîrê aşmî ra reyke, bi sernamey "Dersim" vecêna. Di ene kovara ke aşmey reşemî de resê destê wendoxanê xo tede nivîsê kirdkî, kurmancî û tirkî estê. Ena kovare bi nivîsa Merheba ke zey yeno vîna-yîn editorê kovare nişta de, mardim tabloyê Tirkîya ya sera 1998'î û gorey enî tehlîlî ra sera 1999'î vînenê.

Di miyanê nivîsanê kovare de nivîsey Nevzat O. Günî: "Anadolu ve Mezopotamya Toprağı ne zaman muradına erecek (Go erdê Mezopotamya û Anadolu çî çax bireso miradê xo)" balê merdimî anceno. Di ene nivîsey xo de Nevzat O. Gün ser rewşey Tirkîye heme de vindeno. Rojnamegeranê tirkî ser, Süleyman Demirelî (ke Demirelî qalê realîtey kurdî kerdbî) û butçeya Tirkîya ke qeybî sera 1999'î amiya birnayışî, vindeno. Di enê nivîse de merdim eşkeno rî dewleta tirkî baş bivîno. Hetêke balkêş ê ene nivîse jî eno wo ke di nivîse de hem ber dîrokey 1920, 1938 û 1970'î de vinderto, hem jî ser enkey vinderto û dîrokey û enka naw pêwa. A. Ekber Çiçekî jî di nivîsey: "60 yıl sonra bir hatırlatma (60 sere dimara vîrafîstin) de serê xiyaretê Reyberî de vindeno û dano zanayîn ke goreyê baweriya Dersimîyan ew û êyê zey ê di miyanê xirabanê însaniyetê yê dîroke de cayê xo girotê. Bedenê nê xiyaretkarî enka di cayo xirab de heps biyo



û ezabê xo anceno.

Di nivîsa "Kurd Alevî Ocaklarının Oluşumu (Viraziya-yînê Ocaxê Kurdanê Elewî)" de Hüseyin Kınacıoğlu û Hüseyin Gündüz, dimay Îslamiyetî de biyayînê elewîyan, serhewedayînê Ba-

ma wo en hût (pîl, gird) vengkerdîne cografyayê may û jiyaney ma wa ke sirgûn de derbas bena wa."

Reyna di kovare de hevpeyvîna ke di qezaya Salihî de bi di hebî kal û pîre dir ameya kerdin, gelêke bal ancena.

ba Îshaqî û serhewedayînê Baba İlyasî û ser ocaxanê ke Dêrsim de yê, vîndenê. Di ene nivîse de ser "Ocaxey Kalê Mansûr, Ocaxey Kureyş, Ocaxey Derwîş Cemal, Ocaxey Seyîd Hesen, Ocaxey Arpaoğlu, Ocaxey Sarisaltik û Ocaxey Düşkün sero yew bi yew vîndenê. H. Azgele jî di nivîsey xo de ke bi namey "Dersim ve Süreç (Dêrsim û Pêvajo)" de ser serhewedayînê Dêrsimî û tehrîbatê ke ser Dersimî de viraziya-yî nişto. Di caykey ene nuştine de dano zanayîn ke pîrsgirêkê înan o herî dijwar wîna ano zîwan: "Di rojê ma de pîrsgirêkê ma wo en hût (pîl, gird) vengkerdîne cografyayê may û jiyaney ma wa ke sirgûn de derbas bena wa."

Di ene hevpeyvîne de kal û pîre koçkerdîne xo, zilmê dewlete yê a çaxî û vîranîne key xo û Seyîd Rizay ana ser zîwan. Di ene hevpeyvîne de merdim hêviyê înan a ke bi Dêrsim ra wa, vînenê.

Nivîsa ke Hüseyin Akarî kerda hedre jî ser jiyaney Mebûsê Dêrsimî Lutfî Fikrî vinderto. Lutfî Fikrî Stenbol de wedo û di jiyaney xo de vera dewlete muxalîf bî. Lutfî Fikrî xeynî mebûstî di xeylê rojnameyan de jî xebitîyawo. Di ene nivîse de zey yeno vînan Lutfî Fikrî Mebûsê Dêrsimî yo. La belê ene nivîse de jî yeno vîna-yîn ke Lutfî Fikrî qeybî (qandê, serva) kurdan çîke nêkerdo.

Xeynî enî nivîsan kovare de raporê Komala Çand û Paştgirotina a Dêrsimîyan ke Pêserameyîne xo yê 5'an arde bî pê û nûçeyê kongre, te de ca girotê.

Xeynî enî nivîsan, henî nivîsê binî, helbestê Ahmet Arîf, Şerko Bêkes, Kemal Burkay û henî helbestê binî ca gêne.

Merdim peynî de eşkeno vajo kovareke bi zîwanê kurmancî, kirdkî rind a. Her çiqas di kovare de nivîsê tirkî zêde ca girotê jî rey bi rey dir nê nivîsê tirkî bibê kemî û kovare heme bi kurmancî û kirdkî veciyo go rindêr bo. Reyna di zîwanê kovare de, di warê rastniştîni de çewtî estê. Zey şixulnayînê tîpê tirkî /ğ/, /ü/ û êb.

SERWÎSA ÇANDÊ

Girtin jî çare nîn e

NEJDET BULDAN



Bi nezanîna hevalên Öcalan, bi îxaneta hindêk dostan û alîkariya dewletên mîna DYA şermezariyeke mezin çêbû. Ji ber ku Öcalan, mirovekî mezin bû. Bi kêmasî û serkeftinên xwe, bûbû sazûmankarekî bi nav û deng. Gelek nîrxên rîziyayî û mirî careke din rakiribûn ser lingan. Hebûna gelê kurd, bi hemû cîhanê dabû pejirandin. Serokê partiyeke şoreşger, hêviya gelêkî bindest bû. Ne tenê bi gelê kurd, an jî endamên saziya xwe dihate naskirin. Dijmin û neyarên wî jî hesabeke mezin, raya giştî jî qîmeteke mezin didayê. Kurtiya

wê birêz Öcalan ev aqûbet heq nekiribû.

Li ser girtina birêz Öcalan, gelek şîrove, nîrxandin û gotin dê bîne kirin û nivîsandin. Ez liy ser bûyerê nasekinim. Şoreş e bi leyiz û lêbên dijminan her tişt çêdibin. Gelek mirovên berkeftî û mezin tîn girtin, an jî şehîdkirin. Paşê kurd hire (hîni) bûyerên hosa (wiha) ne. Mîna Seyîd Rîza, mîna Şêx Seîd û Mela Mistefa. Lê sazûmankariya Öcalan ne mîna ya sazûmankarên ku me navên wan li jor nivîsîne ye. Kurd jî ne kurdên kevin in. Partiya Öcalan jî naşibe partiyên din.

Heke kurd karê xwe yê neteweyî hişyar bin, endam û rêvebirên PKK'ê xwe nû bikin, rê û rêbazên şoreşê careke din di ber çavan re derbas bikin, sazî û rêxistinên bi destê wan hatiye damezirandin bixebitînin, têkoşîn dê berdewam be. Bila dewleta dagirker û hevalbendên wê baş

zanibin ku gelê kurd ne tenê birêz Öcalan e. Erê girtina wî berzebûna moraleke mezin e. Kêmasî ye ji bo kurdayetiyê. Lê belê têkoşîn nasekine. Dibe ku çend roj, bi xem û xemgînî derbas bibin.

Pêwîst e ku em karê xwe berdewam bikin. Ji bo wê jî zanînan pêwîst e. Sazî û dezgehên legal bi rêbazên nû bixebitin. Çalakiyên rîya têkoşînê digirin, heqîya gelê kurd berevajî dikin, bisekinin. Ewrûpa cihê çalakiyên demokratîk û dîplomatîk e. Welat cihê şer û xebatên xurt e. Pêwîst e ku her xebat û çalakî, di bin kontrolan de bin.

Xwendevanên hêja, ev nivîsa di nav hindêk xebatên sazî, dawîanîna hindêk çalakiyan, bi xemgiriyeke mezin hatiye nivîsîn. Û Qetlîama Berlînê ya ku bi destê sîyonîstan çêbû jî sedemek e. Ji ber wê çendê biborin. Zor destî min kurt e û tevlihev e. Bila Kurdistan sax be.

Cebilxaneyaya çekdarên berzeq

Gelî mêvanên jirêzêder, emê iro li vê xana mezin, serî li kesî banedin ji bo vî karî meyxane û tilyaxxane hene.

Belê, her wekî me da xuyakirin (gelo me dabû xuyakirin?) em dê li vê derê xelatên Komeleya Rojnamegerên Magazîn li kesên xelatgir belav bikin.

Li vê derê digel vê yekê emê gelek tiştên din jî bikin. Bo nimûne koka edetê kevnepereşt biqelînin û li vê derê du mirovên (Mehsûn û Îbo) ku dixwazin xwîna hev birjînin ser xaka pak a welatê me yî xweşik li hev binin.

Îro roja dostanî û hevalbendiyê ye, binêr, du hevrikên hev li kêleka hev rûniştine.

Berpîrsê Inter-starê: Kura Muxtaroguhên Hakan zêde nekîşîne, law tuyê hilkî, xêr e? Erê, ew şagirtê te ye, lê Cem Uzan (xwediyê Inter-starê) ew bedewa ji te nekiriye, bi qasî giraniya wî pere pê dane û ew qas pere jî li reklama wî xerc kiriye. Bi tenê dimênên jî filmê Tarkan bi dehan milyon dolar lê çûne. (Kamera giş dizivirin wî alî, li ser vê yekê spiker Jiro û Pijê dengê xwe berzîr dikin.)

Gelî mêvanan niha jî em dest bi dayina xelatan dikin. Em Banû Balkon (bi rastî jî hêjayî rûniştina şah e, beredayî jê re şaneşin nehatiye gotin.) Gelê mêvanan jî me nepirsin ji ber ku em jî nizanin Balkon bi ku de-



ra xwe ve ev xelat girtiye.

Niha jî em xelata spikeran didin, gerçî Pijê Xanim ne spî ye, hinekî gewr e, lê dîsa wê xelat girtiye. Em wê pîroz dikin.

Belê gelî xelatgir û xelatgeran, (kesên ku negirin jî bi hêviya girtinê hatine vê derê, ango ew li xelatê digerin, lewre jî mirov dikare wî navî li wan bike), îcar dor hate ser xelatên muzîka xwerû, xelatgir Ahmet Kaya ye.

Kaya: Ez vê xelatê li ser navê Komeleya Mafên Mirovan û Dayikên Şemiyê digirim.

Belê çavên min ji ber ku ez bi eslê xwe kurd im. Min straneke bi kurdî amade kiri-

ye û klîpek jî ji bo wê kişandiyê, îcar ez li hêviya kanaleke wêrek im ku karibe vê stranê biweşîne.

Koroya tovtirkan: Dakeve ji wir, em giş tirk in, Tirkiye ya tirkane. Terorîst, guhên te lê ye tu çî dibêjî.

Spiker: Belê mêvanên jirêzêder, li cihê xwe rûnin. Niha jî em gazî Serdarê Revokan dikin.

Serdarê Revokan: Kes ne şah û ne jî padîşah e, lewre padîşahan jî daye ser şopa Atatürk, giş bûne kemalist. Ev welat parçe nabe, Xaçepêk ji nexşeyê veder nabe. Min leşkeriya xwe li Girtîgeha Leşkerî kiriye, kes nikare li ba min qala kurdan bike.

Spiker: Spas Serdar kerem kin cihê xwe.

Niha jî dor hate ser xelata spikerên me çûyên meçêtirkan. Belê Muxtar xelat girtiye, Hakan jî ber ku guhekî wî hatiye hilkerin, jî pêşbaziyê ket.

Muxtar: Ez gazî Koma (bê)awênayan dikim, da ku strana Mem le ketim bibêje. Hemû koroya tovtirkan li sehneyê dicivê dest bi stranê dikin.

Mem le ketim/ Em çawa bi vê dafikê ketin/ Ew kurd jî ku derketin.

Îbo û Mehşûn: Me m le ke'tim/ Em çawa bi vê belayê ketin/ Axxxx! 'ew kurd jî ku derketin.

Spiker: Herin cihê xwe gelî mêvanan, em bawer in, Ahmet Kaya bi çewtî hatiye vê derê. Ji kirî ku çûye filmê Mem û Zîn lewma qala kurdan kir.

Koro: Em ê mijarê bi wî bidin fêhm kirin. Ev der ne seta Mem û Zîn e. Warê xelatgirên magazîn e. Magazîn ne hespê bizîn e û ne gotinên bimêzîn û wezîn e. Magazîn cebilxaneyaya çekên bitin e. Ew jî mîna bayê xerbê hênik nîn e. Dişibe bayê ku felek bi ber mirov dixîne. Gêj dike mirovên bê mehîn, disewişîne. ŞÛRKÊŞ MAGAZÎNZAN

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (160) XAÇEPIRSA

Çetivî Kurdîstaniya Pîrovan wî	K	Li xanên hêzdar Bûn, îcar xan	E	Demkê ber Sêwîde îro	A	Îro Çetivî	A	Sakir Stranê ke kurd	2	Ebraxîm
Her	R	Her	Z	Î	K	A	R	T	A	L
Nasir	L	I	B	A	V	A	N	O		
Tipe dî Dewgêrî kurdî	B	E	R	E	N	D	A	M	T	Î
Her	Ş	N	A	K	Î	N	Î			
Her	Û	T	Î	I	D	A	Î			
Demkê îro	R	O	M	A	N	D	I	N		
Her	Z	A	V	A	N	Î				
Her	K	A	R	N	Y	N				

PEYVA VEŞARÎ →

Bersiva Xaçepirsa 158'an


Xaçepirsa me bi xelat e.
Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 160'î pirtûka Weşanxaneyê Perî 'Dağlarında Öldür Beni' ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepîrsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 158'an Pirtûka 'Xewna Avê' qezenc kirine ev in: Ahmet Çelebi/Stenbol, Murat Aslanhan/Stenbol, M.Ali Yaman/Enqere, Fırat Akmaz/Stenbol, Xelil İbrahim Dost/Mêrsîn

Hişyar	Mirov tere diçe hundir	Partiyeke kurdan	Stranbêje ke kurd	Sembola iyotê	Teyrek
Hunermandek Wêne	Tipek	Tipek	Tipa pêşin		
					Bi aqil
Tipek	Dijberê pêşin	Sembola potasyomê	Tipa dûk'yê	Zayîn (dema borî)	
Kalik		Karbidest	Cephe-ênî		
			Bekar		
			Himdar		
Pêşgîrek		Naveki mîran			Dijwateyê kevî
Gihanek		Elok berepaşki			
	Ne di xew de			Pir	
	Heqî			Cihê avjê dertê	
Menzereyek					
... Kurdo Niviskarek					
				Cihê genim herandî	
Tipa pêncan					
Hevalê kevan	Bi kirdki gelan				
		Tipa dûq'yê		Bi kirdki çû	

PEYVA VEŞARÎ →



Komployê navneteweyî ser

Şarê ku

Şarê kurd ewro her cayê cihanî de werîştê pay û iyê kiştê ra serokê xo rê wayir vejîyenê, kiştê bînra jî wayiranê nê komploy ra hesab pers kenê.

Serhewadayin û paywerîştinê şarê kurd ser, Yewnanistana sûcî çekena Kenya ser, Kenya ya çekena Yewnanistan ser. Feqet şarê kurd o, nay rind zano ke giştê hemû dewletan nê komploy de esta.



Zey dîroka şaranê bînan, dîroka şarê ma de jî rojê taybetî estê. Nê rojê taybetî serhewadayinê PKK û serokê giştî yê ci Abdullah Öcalanî peyra bî vêşî. Vaten ke ca de bo, o roj ra tepeya qe jew roj û seat bêmahna nêravêrd û oyo hewna jî nêravêreno. Her roj û seata şarê ma bî wayirê qedr û qîmetî. Roj û seatî qandê raveşiyayin amoriyay û iyê amoriyenê. Wa kes nay xo vîra mekiro, qediyayinê her rojî, rojê reyayin (xelsiyayin) û azadî xoya piya ano nezdi. Ne Amerîka, Yewnanistan, Îsraîl û Tirkîye û ne jî welatê împeryalistê meşê ê rojê reyayin û azadî şarê kurd dest ra bigirê.

Ewro hemû televizyon, rojnamey û ajansê, komployo ke hetê dewleta Amerîka, Îsraîl, Tirkîye, Yewnanistan û Kenya Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî rê virazyaya piya, paywerîştin û serhewadayinê şarê kurd temaşe kenê. Şarê kurd ewro her cayê cihanî de werîştê pay û iyê kiştê ra serokê xo rê wayir vejîyenê. Kiştê bînra jî wayiranê nê komploy ra hesab pers kenê. Serhewadayin û paywerîştinê şarê kurd ser, Yewnanistana sûcî çekena Kenya ser, Kenya ya çekena Yewnanistan ser. Feqet şarê kurd o, nay rind zano ke giştê hemû dewletan bi taybetî jî dewletê ke nameyê ci nê cord ravêrenê pêrin nê komploy de esta.

Qandê giştê nê dewletan nê komploy de vinayin lazim niyo kes siyasetkar û zanabî bo. Heme çi eşkera yo. Gama ke we-

zîre karê teverê Yewnanistanî qîseyê kerdê, kesî vatê qayê wezîrê karê teverê Yewnanistan niyo, wezîrê karê teverê Tirkîye yo. Wezîrê Karê Teverê Yewnanistan Pangelosî ê qîsanê xoya jew lahneta şarê kurd tenya nêgirot, nahletê şar û siyasetkarê yewnanî jî girot. Wa nê vatenan ra sûcê hokmatê yewnanistanî çin-yo, sûc tenya ê wezîrê karê teveriyo fahm mebo (nêbo). Sûc, sûcê hokmatê yewnanî yo.

Rolê Kenya û Îsraîl

Ze ke yeno zanayin şarê kurd, şarê yewnanî, şarê yewnanî jî şarê kurd verî ra hetanî nika tim û tim zey dostan û birayan dî. Mayê bawer kemi şarê yewnanîyo hesabê nê kerdenanê lîminan (qîlerinan) hokmatê xo ra pers bikiro û dostin û birayina xo fina bimûsno şarê ma. Eke hokmatê xo ra hesabê nê kerdenanê lîminan pers mekiro û bêveng bimano, şarê kurd şarê yewnanî rîpela xo ya birayin û dostin ra vejo, nêhaq nêhesibyeno.

Giştê hokmatê Kenya vatenan û qîsanê wezîrê karê teverê ci ra viradê girandan (pîlan), qeçikanê (domananê/ tûtê) vizêrinan fahm kerdê. Vatenanê wezîrê karê teverî ra kesî vatê qayê wezîrê dewlet niyo, endam yan jî serdarê partiya bêkes o. Oyo vano qayê ma qeçekê vizêrin im, coka şeño ma bixapeyno. Kenya nê komploy de ca girotina şar û dîroka xo rê jî îxanet kerd. Çi ke şarê Ken-

ya zey şarê kurd û zey şaranê bindestanê bînan zilm û zordarinê serdestan ant û rind zanê. Kenya hetanî sera 1963'ê de bindest bî, sera 1963'ê de xoserîna xo îlan kerd. O çax serokwezîrê Kenya Komau Kenyatta zilm û zordarinê serdestan nê qîsana da silasnayin: "Wexto ke misionerî amey, incil înan destbî, har Afrika-yijan destbî. Çimê ma racenay û duaykerdîm musnay ma. Wexto ke ma çimê xo akêrdî, incil bibî ê ma, har bibî ê înan". Bi rastê nê qîseyê tenya her çi eşkera kenê. Lazim bi ke kesê ke nê qîsanê dîrokî zanê, komployo ke qandê serokê şarê bindestî rê virazyayin de ca megirotayê.

Giştê Îsraîl ser qe muhîm nêkeno kes tevayê jî vajo. Çi ke giştê Îsraîl jew nê komploy de tenya nê, hemû karanê lîminanê Tirkîye de û guniya her kurdî de esta. Dewlata Îsraîla guniya kurdana mird nêbena û wazena tim û tim guniya xortanê kurdan birijno. Eke wina nêbiyayê karê subayanê Îsraîl tiyaranê tirkan de çi-çiyê? Kamo pilotan û kontrane dewleta tirk perwerde keno. Çira hendayê tanq û tîfingê modernî dana Tirkîye. Ancî wexto ke no nivis nusayê kurdê ke qandê komployo protesto kerdin Balyozxaneyê Îsraîlê Berlin verde ameybî pêser, xebatkarê balyozxaney gule panayina, 4 xortê kurd kiştî. Komployo protesto kerdin şar şiyoyî wîja û wasto ke kerdina demokratîk virazê, feqet balyozxaney ra guleyana ce-wab diyayo û 4 xortê kurd wîja mardî û 13

xortê kurdan jî bibî dirbetin. Na biyayin peyra jî Serokwezîrê Îsraîl Netenyahû qe nêşermayina, sûc dînda şarê kurd ser û da zanayin ke xebatkarê balyozxanî qandê xo pawitin winî kerd o. Peyra jî Îsraîl hetanî wextê kê balyozxaneyê xo yê welatanê Ewropa racenay. Nê hemû biyayinê giştê Îsraîl eşkera mûsnayina piya, vatenê ke şarê kurd hetanî nika qandê na dewlet ardî zîwan, rast vetî.

Aqildar Amerîka ya

Dewleta Amerîka xora aqildar û wayirê nê dewletan pêrin a. Hemû aqil hetê na dewleta diya û vernî ra hetanî peynî organizasyon û kerdenî hetê na dewleta virazyay. Çi ke Amerîka senî kerd, nêşa PKK biyaro rayda xo ser û nêşa serokê PKK Abdullah Öcalanî zey Barzanî û Talabanî bikiro. Eke serokê PKK zey wastena Amerîka bixeftiyayê û watenê ci biyardayê ca. Amerîkada yê Öcalan jî zey Barzanî û Talabanî veyndayê xo het. Feqet hetanî peynî na wastena Amerîkaya ca meyro û wastena ci na, ci qirik de bimano. Şarê kurd o, serokî û verniyina Öcalanî de bireso rojê serkewtin û azadî. Hemû dinya jew bo jî iyê meşê verniyina rojê serkewtin û azadî bigirê. Biyayan, paywerîştin û serhewadayinanê şarê ma ra noyo eşkera ayseno. Êkê ney nêvînenê wa çimanê xo akirê û wa bewnê rîdê kurdan bes o.

MEMED DREWŞ

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (Imtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beşiktaş/İstanbul

TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karê Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NIVİSGEHEN TÊKILJYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:

M. Ali Doğan
Tel: 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fevzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsvî

Di çapemeniya cîhanê de komplo û berxwedana gelê kurdan bo kurdan leheng e

Komploya navneteweyî bi revandina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan gihîşt qonaxê nû. Bi vê yekê gelê kurd li seranserê cîhanê dest bi serhildanê kir.

Dîlketina Öcalan û çalakiyên gelê kurd di medyaya nivîskî û dîtarî ya cîhanê de cihekî berfireh girt. Ajansên navneteweyî yên wekî Associated Press, BBC, Euro-News, CNN û Reuters digel bûyera Öcalan cihekî berfireh dan çalakiyên kurdan û kêşeya kurd.

Bo nimûne BBC'yê nûçeyêke dosyayî ya berfireh li ber kurdan û PKK amade kir. Di vê nûçeyê de digel bûyerê, li ser dîroka kurdan û PKK jî hatiye rawestandî. Di nûçeyê de tê gotin ku Öcalan ji hêla rejîma tirk ve wekî terorîst tê binavkirin, lê ji nav 20 milyon kurdên li cîhanê û 12 milyon wanên li Tirkîyeyê gelek kes Öcalan wekî lehengekî dibîne. Nivîskar gotina xwe bi rengî didomîne: "Öcalan avakê sereke yê neteweperweriya kurdan e."

Di nava nûçeyê de li ser rengê darizandina Öcalan tê rawestandî û şik û guman li ser dadyariya dadgeha tirk tene zimên. Li gorî amadekarê nûçeyê hevalbendên dewleta tirk çareseriyê siyasî dixwazin. Lê nivîskar dide zanîn ku dewleta tirk piştî girtina Öcalan ketiye psikolojiya serkeftinê, lewre dê xwe nêzî çareseriyêke bi vî rengî neke.

Ajansa navneteweyî Associated Pressê nûçeyên berfireh li ser bûyerê amade kir. Di nûçeyên vê ajansê de digel dîtin û ramanên tirkan û çalakiyên kurdan, dîtinên Nûnerê ERNK yê Yekîtiya Welatên Serbixwe Mahir Welat jî hatine girtin. Welat vê nirxandinê dike: "Ez piştrast im ku dê dîlketina serokê me şer gurtir bike, dê tekoşîn bigihêje du-sê qatî asta berê."

Dewletên Ewropayê li ser daxwaza çalakdarên kurd ji Tirkîyeyê xwest ku Öcalan li dadgeheke dadyane bê darizandin. Li gorî agahiyê ku ajansa BBC dane, Yewnanîstanê ji bo pêkhatina ewlehiya jiyana Öcalan serî li Yekîtiya Ewropayê daye. Ligel vê yekê radeydarên tirk li aliyekî gefan li raya giştî ya cîhanê dixwin, li aliyê din jî îdia dikin ku dê dadgeh dadyane tevbigere. Bo nimûne li gorî nûçeyêke Reutersê Ecevit gotiye: "Mafê tu dewleta ewrûpî nîn e ku dersan bide me." Her wiha di nûçeyên hemû rojnameyan tê bibîrxistin ku dê Öcalan li DGM'ê bê darizandin û DGM jî dadgeheke taybet û ne hiqûqî ye.

Tevî hemû gotinên rayedarên ên bi rengê "dê dadgeh dadyane be", sê



parêzerên Öcalan ên Holandî ji balafirgeh bi şûn ve hatin zivirandin. Vê bûyerê jî di çapemeniyê de cihekî taybet girtiye. Associated Pressê cih daye gotinên parêzera Öcalan Britta Boehler. Ew vê nirxandinê dike: "Tirkîyeyê dil

nîn e ku şansê herî biçûk jî bo darizandina dadyane bide Öcalan."

Ajansa Reutersê roja 16 mehê nivîseke nirxandinî ragihandiye aboneyên xwe. Di nivîsa bi sernavê "Dîroka kurdan a ku bi xwînê û sozên ku nehatine

girtin hatiye neqîşandin" de li ser dîroka Kurdistanê hinek agahî hatine daye.

Di nûçeyên ajansan de li ser berpirsê revandina Öcalan jî tê rawestandî. Ji nûçeyên ajansan diyar dibe ku serlistikvanên bûyerê Amerîka, Îsraîl, Kenya û Yewnanîstan berpirsiyê dixwistin. Gotinên parêzerê ERNK'ê yê yewnanî Failos Kranidiotis her tişt zelal dike. Kranidiotis diyar dike ku Öcalan bi zorê ji Konsolosxaneyê Yewnanîstanê hatiye derxistin. Hê roja 5'ê reşemiyê jê hatiye xwestin ku wê derbiterikîne. Ev gotinên Kranidiotis di nûçeyêke Reutersê de cih girtiye.

Di çapemeniya nivîskî de jî dîlketina Öcalan û çalakiyên kurdan cihekî berfireh girt.

Basler Zeitung (Swîsre): Heke Ewropaya ji Tirkîyeyê darizandineke dadyane hêvî dike, xwe dixapîne.

Corriere della Sera (Îtalya): Bûyera Öcalan rûreşiya Ewropayê ye.

La Repubblica: Ji xwe giyotinê rizgarkirina Öcalan rîyeke tenê heye, di Tirkîyeyê rakirina cezayê îdamê bê xwestin, ji bo wê rîyê jî biryardariya siyasî pêwîst e.

De Standaard (Belçika): Dê çapemeniya cîhanê li ser Tirkîyeyê be.

Le Soir: Kêşeyêke kurd a bi tirkan re nîn e, bi tenê terora dewletê heye.

El Pais (Îspanya): Ji bo darizandina Öcalan bi awayekî dadyane divê ji Tirkîyeyê garantî bê xwestin. Her wiha divê bûyera Öcalan ji bo çareseriyê kêşeya kurd bibe sedema dordayina Tirkîyeyê.

Maariv (Îsraîl): Dê Tirkîye ji girtina Öcalan pişman bibe. Dê çalakiyên kurdan gurtir bibin û li Tirkîyeyê jî belav bibin.

Magyar Hirlap (Macarîstan): Bêkerî û durûtiya civata navneteweyî Öcalan xist rewşa periyan. Li holê gelekî ku divê bi awayekî serbixwe bîjin heye. Lê kes newêre li Rojhilata Navîn a wekî bombeyêke ye, statûyê biguherîne.

Sewodnja (Rûsya): Kêşeya kurdanê di jî bo cîhanê bûye serêşek.

The New York Times (DYA): Divê her du alî jî (kurd û tirk) bi awayekî erênî tevbigerin.

Washington Post: Heke Tirkîye ji darizandineke vîtrînî dûr bikeve, vê çaxê berpirsî dikeve ser milê Öcalan. Ji ber ku wê gavê dê ji bo kêşeya kurdan forûmeke navneteweyî derkeve holê.

S. BERBEVA